Rıza ÇOLPAN



# HİROŞİMA DUWEM HELEBCE

RIZA ÇOLPAN

# HİROŞİMA DUWEM HELEBCE

Weşanên Dersim

Weşanên Dersim : 3
Çapa Yekem : Çıleyê Pêşin 1994

Adres:

Rıza Çolpan
33 Villiers Str.
Merrylands 2160
Sydney/AUSTRALIA

N A V E R O K


Pêşgotın.........................5
Strana Dêrsım....................10
Bıra ê Kurd......................13
Kurê Kurd........................14
Çar dıjmın.......................15
Bıraziya mın Zayide..............17
Tu megire........................19
Şiyarbın, yekbın.................20
Bang.............................22
Xwin dıbari......................23
Yekbın...........................24
Êdi bese.........................25
Em bêkesın.......................26
Pêşmerge û Şoreşgeran ra.........27
Jı bona hın Kurdan...............29
Kaleki gundi, Xıdê Bextiyaran....31
Stranek geleri " Şev şeve ".......39
Dışewıte kezewa mın..............41
Ez û tu..........................42
Jı gırtiyên Kurdan ra
" Dılorinım "....................46
Megire dayê......................47
Bira mın hat.....................48
Dıvê em rabın....................49
Hêviya dayikê....................50
Tên ber çavên mın................51
Jı bo welat......................52
Rewşa Kurdan.....................53
Gelê hejar.......................54
Jı bona mırına mamoste Cigerxwin....55
Xeyal............................57
Gıliyên pênûsê...................61
Memê Şıvan.......................62
Ma çı ferq heye?.................72
Newroz...........................76

Jı dayikê ra........................80
Birnabın...........................82
Beri her tışt mırovım..............85
Canê, canê.........................88
Tu şirini..........................90
Kedxwarın teres....................91
Namek jı dayikê ra " Bawer bûme "...92
De rabe Kurdo......................94
Oy dayê............................96
Bese kor mebe......................98
Nasbıkın...........................99
Gula kesk û sor zer................101
Dêrsım warê şêrane.................102
Nalina hezar salan.................104
Serastke xwe.......................106
Rewşa ber çav......................108
Banga bırati.......................110
Gelek salın........................111
Kurdperwer te birnakın.............113
Helebce............................117
Çend çarinên pêşneyari.............121
Reş gırêdan........................127
Disa jiyan jehr kır dıjmın.........177
Derketına PKK......................255
Çarinên dılşabûnê..................259

## PÊŞGOTINA NIVİSKAR

Xwendevanê hêja,
beri ku tu bıkevi nav xwendına rûpelên ev pırtûkê, ez dıxwazım piçeki lı ser dirok û tekoşinên Kurdperwerên Kurdıstana Başûr rawestım û qasa zanina xwe te, we, lı ser ew tekoşinan û ew perçe ê Kurdıstan de serwext bıkım. Jı bona hın kar, xebat û çalakiyên Kurdperwerên ew herêma HELEBCE û jı bona ew pênc hezar cangoriyên Kurdıstan ji, ez bı cûdahi, lı beri helbesta xwe a nav "Reş Gırêdan" de jı wera bınıvisinım û we lı ser ew bûyer û barbariya Saddam'ê xwinxwar û faşist de piçeki agadar bıkım.

Ez naxwazım pırr bıkevım kûrahiya dirokê. Jı ber ku ew babeta, babeta ev pırtûkê nine. Çawa ku hûn ji dızanın, lı pışti şerê cihan ê yekemin û Peymana Sewrê de, dewleta İngiliz dewsa xwe dabû ser Iraqê û Kurdıstana Iraqê. Dewleta Fransız ji ax a Sûriyê û Lubnanê kırıbû bın bandûra xwe. Ango ew herdu welat ji bûbûn mêtingehên Fransız, lı para dewleta Fransız de mabûn.

Lı sala 1918'de, dewleta İngiliz hukma Kurdıstan'a başûr da dest Şêx Mamût Berzenci. Lê bı rasti Şêx Mamût Berzenci doza Kurdıstanek Serbıxwe dıkır. Lê sed mıxabın ku pırr caran daxwaziyên mırovan bı gora dılê mırovan nayên cih. Ê Şêx Mamût ji werge bû. Bı kurtasi hukma İngiliz ew daxwaziya Şêx Mamût nepejırand. Jı bona ew, Gulana 1919'de, Şêx Mamût lı dıji dewleta İngiliz serihılda û lı navbera hêzên Kurd û İngiliz de şereke gewre lı dorbera çiyayê Qefe de destpêkır. Lı ew şeri de kurdên Hemewendi jı gelê xwera bêbextiyên mezın kırın; bûn caşên dewleta İngiliz, lı tev ew dewleta mêtinkar bırayên

xwe kuştın. Lı ew şeri de Şêx Mamût birindar bû û disa bı bêbextiya Hemewendi'an va Şêx dil hate gırtın. Hukma İngiliz lı destpêkê de fermana dardakırınê jı bona Şêx derxıst, lê dûra ew bıryara û ew fermana guhart û Şêx Mamût sırgûne Hindıstanê kır. Lı pışti ew sırgûnkırına Şêx Mamût de, gelê Kurd vala nesekıniya, tekoşin lı ser tekoşinan pêk hatın û hukma İngiliz bêt havıl ma Şêx Mamût şuva ani.

Belê, lı pışti ew bûyeran, roja 14 ê meha Tabaxê 1922'yan de, Kurdên Kurdıstana Başûr lı bajarê Sılêmaniyê de, cıvinek mezın çêkırın. Lı pışti gelek axaftın, pêşneyar û pêşniyazan de hılbıjartın çêbû û lı ew hılbıjartınê de Şêx Mamût hate bıjartın û Şêx xwe kır Padişahê Kurdıstan. Lı pışti damezrandına dewlet û karbıdestek Kurd de, Şêx Mamût Berzenci dıbistanên Kurdi ava kırın û xwendın, nıvisandına Kurdi destpêkır. Dıravên dewleta Kurd û pûlên posta kurdi derxıst. Jı bona ew tevgera Şêx Mamût Berzenci, hukma İngiliz geleki bêkêf û eciz bû. Xwast ku ew dewleta kurdi bıxurine. Jı bona ew ji, lı 4'ê meha Adarê, 1923' yan de, leşkerên İngiliz êriş dan ser bajarê Sılêmaniye'yê û bajar bombebaran kırın. Xêncı Sılêmaniye'yê, her usa gelek gund û cihên dın ji hatın bombebarankırın û bı hezaran Kurd cangori bûn. Lı pışti ew bêbextiyê de, icar hukma mêtinkar, dewleta Iraqê da damezirandın û hukma Şêx Mamût ji temırand û lı holê rakır. Lı pışti ew bûyer û bınketına tevgera Şêx Mamût Berzenci, icar dı sala 1931-1932'yan de, gelê kurd carek dın lı dıji hukma İngiliz serihılda û kete nav şereki gewre. Serokatiya ew serihıldanê, bırayê Şêx Abdulselam, Şêx Ahmet gırte destê xwe û ew serihıldana bı mêrani domand, dûra ji ew karê xwe radeste bırayê xwe Mele Mıstefa Barzani kır.

Lı sala 1942'yan de, lı Kurdıstana İranê de, Komela "Jiyanewey" hate damezrandın. Lı sala 1945'an de ji, avakarên ew komelê, komel hılşandın û lı şûna ew komelê de " Partiya Demoqrat a Kurdıstan" damezrandın.

Lı meha çıleyê paşın, 1946'an lı kurdıstana Rojhılat de "Komara Mehabadê" hate damezrandın û êlan kırın. Lı pey damezrandına ew Komara Kurdıstan de, icar Mele Mıstefa Barzani bı eşq û dıl tev 800 pêşmergeyên xwe va çû Kurdıstana Rojhılat bû Serdarê artêşa ew Komara Kurdıstan. Ango Komara Mehabadê. Pışti xurandına ew Komara Kurd de, Barzani lı tev pêşmergeyên xwe dageriya Kurdıstana Başûr. Lê mıxabe ku hêzên dewleta Iraqê bûn asteng, nehiştın ku Mele Mıstefa Barzani bıkève Kurdıstana Başûr. Lı ew dema heri dıjwar de, Barzani bêt havıl ma, lı tev 500 kes hevalên xwe, bı peya berê xwe dan Yekitiya Sovyet. Lı pışti hezar dıjwariyan û meşa 52 rojan de xwe gihandın sinorê Yekitiya Sovyet û felat bûn.

Mele Mıstefa Barzani tev hemû hevalên xwe 12 sal lı Yekitiya Sovyet de man. Ew mırovê mêrxwas û nemır, lı tev hemû hevalên xwe lı Yekitiya Sovyet de çı ditiye û çıqas dıjwari kışandiye, ez qal û behsa ew tıştan ji nakım. Jı ber ku ew tıştana hım babeta ev pêşgotına mın ninın, hım ji, bı sedan rûpelan dıxwazın. Dı roja 14-7-1958'an de, lı Iraqê, bın serokatiya Abdulkerim Qasım de, şoreşek çêbû. Lı pışti ew şoreşê de, hukma Abdulkerim Qasım, heqê gelê kurd ji pejırand û ew heq dayin kıre deqek Makzagona mıweqet û êlan kır. Ango ew deq, deqa sêyem bû. Lı pey ew şoreş a Abdulkerim Qasım, Mele Mıstefa Barzani tev hevalên xwe dageriyan welêt. Lı pışti heyamek heri kurt de, ew heq dayin

jı bona gelê Kurd bû xewn û xeyal. Ew gotın hemû lı ser qaxızan de man û hukma Abdulkerim Qasım ji çu heqek neda gelê Kurd. Jı bona ew bêbextiyê "Tekoşina Rızgariya Kurdıstan" disa lı bın serokatiya Mele Mıstefa Barzani de hate domandın. 8-3-1963'yan de, lı Iraqê şoreşek dın çêbû û vêca ji Abdulselam Arif bû Serok Komar û ew ji heya sala 1966'an lı ser hukım de ma.

Lı pışti sala 1966'an de, icar dolıwa dewletê kete destê Abdulrahman Arif. Serok Komariya Abdulrahman Arif ji, heya 17-7-1968' an berdewam kır. Lı pışti ew rojê û dirokê de, hukma Partiya Baas dolıwa dewletê kıre destê xwe, Ahmet Hesen Bekır bû Serok Komar, Saddam Husênê xwinxwar ji bû cigırê wi.

Hukma Partiya baas 13-3-197O de, heqê gelê Kurd ê Xwemuxtariyê, ango heqê Otonomiyê pejırand, lê sed mıxabın ku, ew bıryar û gotınana ji, disa lı ser rûpelên qaxızan de man, hukma xwinxwar çu tıştek neda gelê Kurd.

Lı 16-3-1974'an de, şoreşa Kurdi disa lı bın serokatiya Mele Mıstefa Barzani de destpêkır. Lı pışti destpêkırına şoreşa Kurdi de, icar tevgera ew şoreşa Kurdi, Zaningeha Kurdi dı roja 24-4-1974'an de lı Bexda'yê rakır bır Qeredızê. Jı bona ew tevgera gelê Kurd ji, hukma Baas her har û eciz bû. Jı ber ku Zaningeha kurdi rabûbû ser erdê Kurdıstan.

Lı sala 1975'an de, lı Cezayirê hukma Baas û Şahê İranê, Şah Rıza Pehlewi rûnıştın lı nav xwe de peyman çêkırın. Lı ew rojê de hukma Şah arikari neda tevgera Kurd û tevgera kurd bêt arikari hışt. Lı pışti ew, hukma Baas bı barbari êriş da ser

tevgera Kurd, Mele Mıstefa Barzani şer tenkand û çû Tahranê. Hukma Baas 4OOO hezar gundên kurd hemû xurand, bı sed-hezaran gelê Kurd sıgûne çolan kır, Kurdıstan tar û mar kır, şêland.

Lı pışti ew bêbextiyê de, hın pêşmerge lı ser çiyan de man û carna êriş dıdan ser dıjmın û xesereyên mezın dıdan hukma Iraqê.

Dı roja 3O-7-1979' an de Saddam Husênê xwinxwar hate ser hukım. Lı eyni salê de şoreşa Xumeyniyê kevneperest lı İranê çêbû, Şah reviya û Xumeyniyê paşverû hate ser hukım. Lı pışti ew şoreşê de pırr zeman derbaz nebû, icar Saddam Peymana Cezayirê çırand û êriş da ser İran. Şerê Iraq û İran'ê heşt sal berdewam bû, nêzıka milyonek kesên bêt sûc û gune hatın kuştın, dûra ew şera ji hate temırandın.

Xwendevanên eziz,
ez dıxwazım ev pırtûka xwe bı taybeti jı bona biranina pênc hezar cangoriyên Helebce, jı bona cangoriyên Qoçkiriyê, cangoriyên tevgera Şêx Said'ê Piran, cangoriyên tevgera İhsan Nûri Paşa, serihıldana çiyay Agır, jı bona cangoriyên Dêrsım û hemû cangoriyên Kurdıstan pêşkêşe hemû gelê Kurd, bı taybeti ji pêşkêşe cıwan û neslên peyhati û xwendevanên peyhati dıkım. Bıla gelê Kurd û cıwanên peyhati lı ev pırtûkê bınhêrın, bıxwinın û ev pırtûkê lı malên xwe de mina Albûmek gıranbıha û xezineyek heri hêja bıparızın.

Bıla cangoriyên kurdıstan lı nav nûran de razın; gelê Kurd wana cangoriyên xwe birnake.

## STRANA DÊRSIM

Dêrsım nav çar çiyan da
Hêstêr çavên daykan da
Zar, zêçên me şewıtandın
Bın xani û cılan da

Çıbû lı Dêrsımê çı bû?
Dost giryan, dıjmın şabû
Welatê me Kurdıstan
Bın lıngan de xızan bû

Bıpırse çemê Mınzûr
Çıqas kuşt zarokên hûr
Ew ax a erdê Dêrsım
Bı xwinê bû gola kûr

Çıbû lı Dêrsımê çıbû?
Dost giryan, dıjmın şabû
Welatê me Kurdıstan
Bın lepan de wêran bû

Dêrsım çiya û kani
Keç bûkan şini dani
Mıstê kor ferman derxıst
Leşker koka Kurd ani

Çıbû lı Dêrsımê çıbû?
Dost giryan, dıjmın şabû
Welatê me Kurdıstan
Bın destan de wêran bû

Lı Dêrsım heftê hezar
Dıjmın kuşt wek pez, dewar
Ser stuyên kurên Bılo
Nir dan ser, dûra hevcar

Çıbû lı Dêrsımê çıbû?
Dost giryan, dıjmın şabû
Welatê me Kurdıstan
Bın lıngan de xızan bû

Lıngên wan xasi kırın
Gam dan paş, ew zext kırın
Ser sıncên kerengan de
Canê wan perçe kırın

Çıbû lı Dêrsımê çıbû?
Dost giryan, dıjmın şabû
Welatê me Kurdıstan
Bın destan de wêran bû

Kul derdên Kurdan pırın
Bo azadi dımırın
Leşker berên xwişkên me
Lı bında jêdıkırın

Çıbû lı Dêrsımê çıbû?
Dost giryan, dıjmın şabû
Welatê me Kurdıstan
Bın lıngan de wêran bû

Bınê Dêrsım kelekın
Derd pırın, hûn vemekın
Yek bıbın hêzên Kurd'no
Dılê dıjmın şamekın.
10-7-1980

## BIRA Ê KURD

Kurdıstan çem çiyane
Konan daynın deştane
Gelê mera ev şane
Bıra ê Kurdo, bıra ê Kurd

Destên xwe destên hevdın
Hesın germkın hûn avdın
Pırtûkan bıxwinın tevdın
Bıra ê Kurdo, bıra ê Kurd

Guh medın şêxan, axan
Dozfıroş û caş, segan
Şên bıkın tatan, pagan
Bıra ê Kurdo, bıra ê Kurd

De rabe xebatkaro
Dûkef bıray cotkaro
Cibıhêl ga ê boro
Bıra ê Kurdo, bıra ê Kurd

Teknikê bıkın welat
Welat hûn nekın xelat
Êdi wexta ev şer hat
Bıra ê Kurdo, bıra ê Kurd.

20-29-1980

## KURÊ KURD

De şiyar be, şiyar be
Kurê Kurdo, kurê Kurd
Xwedi welatê xwe be
Kurê Kurdo, kurê Kurd

Tekoşin kev wek şêran
Tu bımır mina mêran
Dersan bıde neyaran
Kurê Kurdo, kurê Kurd

Destên xwe destên hevdın
Gul sosınan hûn avdın
Ku gul sosın qenc bindın
Kurê Kurd, kurê Kurd

Welatê te bındeste
Ne yar heye, ne doste
Beden jare bêt goşte
Kurê Kurdo, kurê Kurd

Dıvê hûn goşt beden kın
Ku Kurdıstan rızgar kın
Dılê gelê xwe şakın
Kurê Kurdo, kurê Kurd.

1O-8-198O

## ÇAR DIJMIN

Gelê Kurd hev qetandın
Hebûna Kurd şêlandın
Welat tevda şewtandın
Çar dewletên malşewat

Şêx, axa wanra bûn yar
Gel nezan, nebû şiyar
Wan hevra keda gel xwar
Çar dewletên malşewat

Kurdıstan parvekırın
Lı nexşan de rakırın
Av û çem zıwa kırın
Çar dewletên malşewat

Dirok, mirok derxıstın
Gelek derew raxıstın
Kurd lı Kurdan dûrxıstın
Çar dewletên malşewat

Gotın"Kurd Tırkên çiyan"
Ew derew lı her ciyan
Dan bajarvan gundiyan
Çar dewletên malşewat

Hevra peyman çêkırın
Sento ji nav lêkırın
Kurdan ra derew kırın
Çar dewletên malşewat.

Lı pışti sala 1965'an de, lı Tırkiyê de piçek navçeek demoqrat çêbû. Lı pey ew êdi lı Tırkiyê de komel û rêxıstın hatın damezrandın. Bı taybeti rêxıstınên çep. Ki bû aligırê Sovyet, ki bû aligırê Çinê, ki ji bû aligırê Ernawût. Lı demek werge de, newiyên Apên mın ji hınek bûbûn aligırê Mao, hınek ji bûbûn aligırê Ernawût, ango Enwer Xoca. Keça pısmamê mın a nav Zayide ji, bûbû aligırê Ernawût û bûbû keçek Enternasyonalist û Kominist. Lı ew demê de bihistıbû ku ez lı Awıstûralya doza Kurdıstan dıkım û jı bona ev doza evrar kar dıkim, icar jı mınra namek nıvisandıbû, lı ew nama xwe de rexneyên mın dıkır. Dıgot " jı tera şerm nine, ku tu bı navê şoreşgeri doza Kurdıstan dıki, em hemû ge lên cihan xwişk û bırane " felan-bêvan. Jı bona ew nama bıraziya mın Zayide, mın jı wê ra ev helbesta nıvisand

## BIRAZİYA MIN ZAYİDE

Bınê mala we, lê tırr û kaşe
Gotına te ne xwaşe, lê ne ji başe
Apê te ne kehre, lê ne ji caşi
  Delalê, hevalê tu bırazi
  Dayika te bındes, çıra naxwazi?
  Şirinê, delalê tu Zayide
  Aqıldarên we şêxe, seyide

Ez Kurdım, Kurdeki dılbırinım
Lı welêt çı dıbe ez dıbinım
Qasa simên porê te dıxwinım
  Delalê, şirinê tu bırazi
  Dayik bındeste çıra naxwazi?
  Delalê, hevalê tu Zayide
  Aqıldarên we şêxe, seyide

Tırkan keçên wek te bed dıkırın
Kêfa xwe dıanin, ber jêdıkırın
Dayikan çıto ew zû birkırı?
  Delalê, şirinê tu bırazi
  Dayik bındeste çıra naxwazi?
  Delalê, hevalê tu Zayide
  Aqıldarên we şêxe, seyide

Cıvaka xeşim wek dewar, peze
Bêt aqıl, bêt raman, ew bêt hêze
Zanin jı mırov ra bax û reze

Delalê, şirinê tu bırazi
Diya te bındest, çıra naxwazi?
Delalê, hevalê tu Zayide
Aqıldarê te şêxe, seyide

Dayka mın, xwişka mın Kurdıstane
Wê felat be rojek bın destane
Kurd bıxwın rûn û to, şir mastane
Delalê, şirinê tu bırazi
Dayik bındeste çıra naxwazi?
Delalê, hevalê tu Zayide
Aqıldarên we şêxe, seyide.

22-8-198O

## TU MEGİRE

Tu meg're meg're, kurê mın meg're
Bavê te kuştın, Kurdıstan namre
   Bavê te şer kır jı bo nıştıman
   Cangori bû çû, bona Kurdıstan
   Destên xwe bıdın hev hûn Kurdıno
   Zû felat bıkın, daykê bındestan.

Gırbe, mezın be, jı xwe birmeke
Ala kesk û sor, pırr-pırr bılınd ke
Bıkev tekoşin, bımre bo welat
Şirê ku mın da te, jı xwe helal ke.

11-1O-198O

## ŞİYARBIN-YEKBIN

Ey bırano hûn wenn em kombın
Em bıbın yek can, bı hevra bıxebıtın
Bıkevın şer û cengan
Dengên me bıla bıbe dengvedan
Xwe bıde kaşan, xwe bıde çiyan
Bıhêjine erd û deryan, heft qat esmanan
Bıhêjine cihan,
Ku zû rızgar bıbe Kurdıstan
  Kurdıstan dayika meye
  Xwişka mın û teye
  Ew namûsa meye
  Şiyarbın, yekbın
Qet birmekın neyaran
Birmekın cangoriyên Kurdıstan
Ewên ku hatıne kuştın bı sed hezaran
Ew kesên bêt gune
Zarok û jınan
Pir û kalan
Leheng û mêrxwasan
Egit û gernasan
Pêşmerge û şoreşgeran
  Ew bavên mene
  Dayika mın û tene
  Çavên xwe hevde
  Bıkeve nav xem û xeyalan
  Bıde ber çavan dûrbinê
  Bınhêre kuştın û xwinê
  Bınhêre Kurdıstanê

Şewata danstanan
Bax û bostanan
Bınhêre lı ew destên gemar
Bın pêştemal û fistanan
Çıto qırêj dıkın namûsa me
Çawa dıqelışının zıkên dayikan
Dıkın ser şılfan zarokên me
Bıra bese veke çavan
Bazde bı lez, bavêj gavan
Zeman tune, dıvê tu rûneni
Me dıkujın çar dewlet
Saddam, Ozal, Hafız, Xumeyni
Jı bona nzgariya welat
Dıvê em bıbıne yek,
Ku Kurdıstan bıbe felat
Jı bona aşitiyê
Xwişk û bıratiyê
Jı bona yekitiyê
Şiyarbın, yekbın.
Lı ser me dıbare berf û baran
Dıjmın welat dagirkıriye
Em kınne mina berx û karan
Canê dıjmınan dıxwaze goşt
Dıxwaze post
Em bûne xwarın jı wanra
Em bûne qurban
Gazi we dıke Rızê Guran
Şiyarbın, yekbın, yekbın.

2O-11-198O

## BANG

Rabın Kurdno, rabın, rabın
Xewa kûrda hûn şiyarbın
Dıjmın jı mera dost yar nabın
Bın lepan de em rızgar bın

Gul çiçega gulıstane
Dayika me Kurdıstane
Ew toye me'l ser mastane
Çıra maye'l bın destane?

Dirokê bıxwinın tevdın
Şêxan, axan gel xapandın
Gel hevdu kuşt xwin rıjandın
Bese rêzan bê guhêrandın

Ev banga Rızê Gurane
Rabın serxwe wek şêrane
Guh medın caşan, kehrane
Em Kurdın hemû bırane

Gul çiçega gulıstane
Dayika mın Kurdıstane
Toyê mıne'l ser mastana
İro maye'l bın destane.

7-13-1981

## XWİN DIBARİ

Bınhêr bıra dayik, bûkan
Ew dıgirın bo zarokan
Qırşûn mina berf û pûkan
Lı ser Kurdan pırr dıbari

Welatê me dagirkırın
Çar perçe bû parvekırın
Rêberên me dardakırın
Şûna hêstran xwin dıbari

Gund û bajarên me Kurdan
Hemû gırtın wan namerdan
Kurd kuştın meyit ser erdan
Man, xwaşan ra zılm dıbari

Em hesreta te welatın
Welat Şirin, em Ferhatın
Kurd dıj hev, bêt itifaqın
Rızê Gur ra, ar dıbari.

10-3-1981

## YEKBIN

Tırk, Ereb, Farıs dıkujın Kurdan
Yekbın bırano yekbın, em hemû yekbın
Leşkerên dıjmınan, ser erdê merdan
Yekbın bırano yekbın, hûn hemû yekbın

Serok, rêberên me ew dardadıkın
Çand û zımanê me zû wendadıkın
Gundan dışewtinın, pag xopan dıkın
Yekbın bırano yekbın, em hemû yekbın

Bıbın yek beden, ku dıjmın derkevi
Lûlkın lı nav gel ruhê Netewi
Bılındkın ala Kurd bıla nekevi
Yekbın bırano yekbın, hûn hemû yekbın

Hebûna Kurdıstan wan paqıj kırın
Dıkujın zar zêçan, em bext reş kırın
Sazûmana faşi, ser me saz kırın
Yekbın bırano yekbın, em hemû yekbın

Şeran de mırın hey, şana mêrane
Ser daxıstıni karê kehrane
Qurbana Kurdıstan Rızê Gurane
Yekbın bırano yekbın, hûn hemû yekbın.

25-3-1981

## ÊDİ BESE

Dıjmınên me, me qırdıkın
Zarokên me serjêdıkın
Kurd'no yekbın hûn rık mekın
Êdi bese, êdi bese

Dıjmın ferman derdıxine
Yek bı yek me dardıxine
Çavên dayikan de xwine
Êdi bese, êdi bese

Tırk û Ereb me dıkujın
Lı dılan de xwin dırıjın
Têne kuştın pir, xort û jın
Êdi bese, êdi bese

Em nıjadek zef ro reşın
Weka kesên gêj serxwaşın
Hın hêz hene çewt dımeşın
Êdi bese, êdi bese

Kurdıstana me şirine
Têda gazin û qirine
Rızê Guran dılbırine
Êdi bese, êdi bese.

27-4-1981

## EM BÊKESIN

Ma çıra em bêkesın?
Bêxwedi û bênasın
Derd û kulan dıkşinın
Kes nabêje ev besın

Lê dayê, dayê, dayê
Çıra rewşa me vayê?
Ew nıfır kê lı me kır?
Em bêt dewlet dınyayê

Em dıkşinın kul derdan
Ti, bırçi lı ser erdan
Em kırın berdest, noker
Wan dıjmınan, namerdan

Ne karxane, ne kare
Dılê Kurd birindare
Janê daye kezewê
Ne bıjijk hey, ne yare.

14-5-1981

## PÊŞMERGE Û ŞOREŞGERAN RA

Pêşmerge û xortên Kurdan
Jı cihanê ra we deng dan
Bo azadi hûn şer dıkın
Hûn canfida, hûn qehreman

Lı zindanên dıjmınan de
Hûn bın zılm û ber kulman de
Serê xwe hûn qet nızm nakın
Ber dıjmın û zılmên wan de

Derê zindanan vedıkın
We dıkın hındır komdıkın
Dıjmınên har, hov dıxwazın
Navê Kurdan wenda bıkın

Dıjmınıno hûn şamebın
Bı kuştınê Kurd kêm nabın
Hezar salên dın ji herın
Kurd cihanê wenda nabın

Dılkeserın xwişk, dê û bav
Bı hezaran wera sılav
Agırê ku dılê weday
Wera bûye cıl û kulav

Lı ser çiyan, lı nav deştan
Ala Kurd we rakır destan
Sıloganên we pırr xweşın
Her bıji Kurd û Kurdıstan

Ey bırano hûn xem mekın
Kurdperwer qet we birnakın
Roja azadi dûr nine
Kurd, Kurdıstan rızgar bıkın

Rızê Guranım dılşinım
Hesreta welêt dıkşinım
Lı dayikê dûrketıme
Hıstrên çavan dırıjinım.

25-5-1981

## JI BONA HIN KURDAN

Hınek kesên Kurd hene
Mina kehran û gane

Dıçênn lı nav mêrgan
Bûne xulamê segan

Dıbên"em Tırkên xasın
Mina qutni libasın"

Betal dıkın eslê xwe
Hım dayik û bavên xwe

Mırov ecêb dımine
Lê havılek nabine

Tırk Moxolın, Kazakın
Tırk Tatar û Ozbekın

Bejn û bala wan kıne
Bêt pırç kose, ri tune

Lê ew kêsên ri û pırç
Bejn dırêj û mina hırç

Çawa dıbın Tırk, Tatar?
Mina wana mırov xwar

Bêt nûçene wek kehrın
Rê wenda, bêt rêberın

Bûne segên dıjmınan
Bona dırav, parik nan

Fırotıne gelê xwe
Tev namûs û warên xwe

Dıvê Kurd wan nasbıkın
Şaşıtiyan rast bıkın

Rê nedın wan û dıjmın
Ev hosiya dılê mın

Bırayê weye Rızê Gur
Gotınên mın mavên dûr.

5-6-1981

## KALEKİ GUNDİ
## XIDÊ BEXTİYARAN

Kalek lı gund de hebû
Şıvan, gavan hejar bû

Ew belengaz, ew hejar
Bı zık bırçi bûbû jar

Tûrık dıgırt pars dıkır
Ew rewşê şıkır dıkır

Navê kalo Xıdo bû
Lı Xozatê hatıbû

Gund de bûbû naxırvan
Jı pez dewar ra şıvan

Carna ji dıçû aşan
Ku pars bıke bo xwaşan

Bona mıstek ardê ceh
Pêş herkesi dest pençeh

Nanê ceh, gılgıl dıxwar
Dıkır şorbe fik, sawar

Rojek têr, rojek bırçi
Çêq jar bûbûn wek pêçi

Pêş gundiyan stuxwar
Bırçibûna gurê har

Xıd ketıbû ew rewşê
Tev kul derd û tev êşê

Carna dıçê das û cot
Xıd dılkovan, Xıd dılsot

Her sal wi naxır dıgırt
Berx û kar wira şagırt

Dıbûn, Xıdê ders dıda
Pez dıçêrand avdıda

Hêviya wi dewar, pez
Ew jı wira bûbû ferz

Xıd bırçibû, Xıd tazi
Ew rewşê dıbû razi

Paşda mabû nezan bû
Bêt mal, mılk û xızan bû

Çavê wi ê çep kor bû
Xwendın lı wi zef dûr bû

Navê jına wi Xeycan
Xıdê ra bûbû rêşan

Xeycan ji bûbû çav kor
Por hıne bû rengê sor

Bı ew rewşê nan dıpat
Nedıdit agır, şewat

Dışewtiya canê wê
Janê dıda dılê wê

Qenc nedıdit ard, hevir
Rawêj avin dıkır şir

Rojên Xecê, mıj, tari
Dıl mırov dıbû keri

Xıd xudanê sê kuran
Êdi ketıbûn dıran

Kurê pıçûk nav Ali
Zık bırçi, dıxwar xali

Ew ji bûbû lıng seqet
Dımeşiya û dıket

Her roj dıçû ber karan
Bın tava germ, bın baran

Rewşa xwe dıdit Xıdê
Dıgot"çıbkın ez Xwedê?"

Xıd berdestê qûlan bû
Xulamê seyidan bû

Ew dengbêj bû dıstırand
Dıgiriya, dılorand

Lı ser kaş û ser çiyan
Rûdınıştı lı bın siyan

Xıdê şev roj pars dıkır
Dıket malan pırs dıkır

Dıgot"hûn jı bo Xwedê
Gelo bıdın mın zadê?"

Lı ser pıştê çal û bar
Dıket hındır xani sar

Ne êzıng bû, ne sobe
Şev dıçû dıhat sıbe

Dıbariya berf û pûk
Qemıryabûn çem û cok

Dema cejna Xızır bû
Şiv lı malda hazır bû

Hemû nefer roji bûn
Ser sıfrê rûnıştibûn

Xıd, Xeycan, Hesen, Ali
Lay mezın çardeh sali

Kurê mezın nav Xıdır
Por kejık bû, rû tıvır

Dıxwarın nan û toraq
Yekser deri kır şeq-şeq

Derva pûk bû, derva berf
Hukma Tırk a bêt şeref

Cenderme tev Serbexo
Bı tıfing û lı tev ço

Deri tandan ketın cih
Şewq tunebû tari sih

Bı qirin û bı ferman
Xıdê de nema derman

Gotın"zûkın hûn rabın
Qet mebêjın mıxabın"

Vegeriyan ser bavê
Pê kur gırtın ew gavê

Gotın"Xıdo kurê te
Ev revoke şerma te"

Lı pêş çavên bav bıran
Êriş kırın wek guran

Xıdê pıçûk dil gırtın
Dest gırêdan derketın

Kelepçe kırın mılan
Qirina bav, ket malan

Der cinar derketın der
Lı pêş dêri heft nefer

Ditın ew rewş, pêşdari
Nalet kırın sed cari

Cendermeyên hov û har
Lı ser berfa sıpi sar

Xıdê pıçûk meşandın
Dılê bavê êşandın

Ew cıwana gırtın çûn
Pêş çavan de wenda bûn

Xıd zarok bû, Xıd cıwan
Dıjmın qet neda eman

Xecê bı dılda nêt kır
Manga Zeri qurban kır

Ku Xıd were serjêke
Dılên der cinar şake

Xıd şandıbûn Rojhılat
Pırr dûr nebû lı welat

Lı Sêrtê de bû leşker
Cihan de domdıkır şer

Xıd bêt zar bû, bêt zıman
Fêm nedıkır qet ferman

Nedızanıbû çep û rast
Zık bırçi, nan nedıxwast

Sıtvan, çawiş, serdeste
Dıgotın"Xıd berdeste"

Barê gıran dıdan pışt
Jêre dıgotın her tışt

Zılm û zor û lêxıstın
Zara guhan derxıstın

Şeş mehan de kırın kerr
Nêm guhan de dıhat der

Çar salan wi leşkeri
Kır, seqet bû vegeri

Nedıbıhist deng seda
Ew dıltepin bû fida

Teskere gırt hate mal
Gihişt bıran, bavê kal

Der cinaran dılşakır
Xıdê qurban serjêkır

Çend sal nav de derbaz bûn
Mal barkırın lı gund çûn

Xıdê pıçûk kırın kerr
Dûra ew bû şoreşger

Xıd, Xecê û sê bıran
Birnake Rızê Guran.

7-1O-1981

## STRANEK GELERİ
## ŞEV ŞEVE

Şev şeve, şev bıhare
Av nahêlın xewkım şeve
Şev şeve, şev bıhare
Çem nahêlın xewkım şeve
  Dıjmıne gurê hare
  Ew nahêle xewkım şeve
  Dıjmıne gurê hare
  Gur nahêle xewkım şeve

Şev şeve, şev zıvıstan
Berf nahêle xewkım şeve
Şev şeve, şev zıvıstan
Pûk nahêlın xewkım şeve
  Dıjmın ketın Kurdıstan
  Derd nahêle xewkım şeve
  Dıjmın ketın Kurdıstan
  Ew nahêlın xewkım şeve

Şev şeve, şev havine
Germ nahêle xewkım şeve
Şev şeve, şev havine
Tav nahêle xewkım şeve
  Kurdıstan pırr şirine
  Yar nahêle xewkım şeve
  Kurdıstan zef şirine
  Tam nahêle xewkım şeve

Şev şeve, şev payize
Ba nahêle xewkım şeve
Şev şeve, şev payize
Xisk nahêle xewkım şeve
  Rût bûne sêv û gûze
  Pez nahêlın xewkım şeve
  Rût bûne hêrmi gûze
  Mışk nahêlın xewkım şeve

Şev şeve, şev tariye
Gur nahêlın xewkım şeve
Şev şeve, şev tariye
Hırç nahêlın xewkım şeve
  Qirin û hawariye
  Deng nahêlın xewkım şeve
  Qirin û hawariye
  Bang nahêlın xewkım şeve

Şev şeve, şev dırêjın
Xewn nahêlın xewkım şeve
Şev şeve, şev dırêjın
Tırs nahêle xewkım şeve

  Dıjmınên dest qırêjın
  Ew nahêlın xewkım şeve
  Dıjmınên dest qırêjın
  Ew nahêlın xewkım şeve.

20-10-1981

## DIŞEWITE KEZEWA MIN

Ey bırano werın werın
Bawer bıkın welat şirin
Hemû hebûna Kurdıstan
Neyarên me hemû bırın

Bo mala xwe xwedi derkev
Bıxebıtın bı roj û şev
Bona rızgariya welat
Piçek lezke tekoşin kev

Namûs tenê xwişk, jın, nine
Qenc bınhêre dıjmın kine
Lıngên ew dıjmınên qırêj
Ser canê daykê bışkine

Sê nıjadên har xwinmıjın
Berdest kırın keç, mêr û jın
Namûsa Kurd ket bın lıngan
Dışewıte kezewa mın.

30-10-1981

## EZ Û TU

Ez û tu hene
Hevalê mınê xebatkar
Bırayê mınê gundi û cotkar
Lı ser ev erdê cihan
Û lı bın esmanê şin
Lı bın Roja Sor û Zer
Û hiva gılower
  Lı nav meda çiya hene
  Çiyayên bılınd
  Gırs û gewre
  Deşt û kaş
  Çem û newal
  Kort û geli
  Dıbın asteng her dem
Yek ji deryayên mezın
Okyanûsên bêt paş û bêt bın
Qutkırıne peywendiyên mın û te
Bûne asteng lı pêşiya jiyan û jin
  Lê disa ji emın
  Xwediyê ev cihan û Xweza
  Lı Rojhılatê heya Rojava
  Em mina teyran dıfırın
  Emın bırûskên ewran
  Dıqelışinın çiyan
  Zıwa dıkın çem û deryan
  Dıkıne gume-gum
  Mina top û tankan
  Bı dengên me erd dılerze
  Esman dıhêje

Kedxwar dıreve
Xwinmıj dıreve
Dengên me dengên karkerane
Gundi û cotkarane
Mırovhez û demoqratane
Xwe gihandiye erdê Medan
Ketiye nav pêşmergan
Derketiye ser çiyan
Deşt û kaşan
Bajar û gundan
Lı tev pêşmergan şer dıkın
Jı bona rızgariya Kurdıstan
Bırano
Hevalno
Lı dılê meda hey daxwaziyek
Lı zıkê meda agırek
Agıreki germ û şewat
Dışewıte mina volkanan
Jı bona welêt
Welat Kurdıstan
Jı bona mafên reben û belengazan
Hejar û zametkêşên cihan
Gundi û rêçberan
Rızgariya gelan
Hevalê mınê xebatkar
Bırayê mınê cotkar
Mafê me yeke
Çina me yeke
Dıvê em bıbın hezkıriyên hev
Bı dıl û can û dev
Jı bona ev armancê xebat bıkın

Bêt westan, roj û şev
Lê ez çı bıkım
Lê tu çı bıki
Lı nav meda hene kehr
Dozfıroş û bêbext
Marên axû û jehr
Bûne nokerên dıjmınan
Xulamê şêx, seyid û keşişan
Berdestê kapitalistên, kedxwar
Kûçıkên emperyalan
Bûne neyarên karker û cotkaran
Êriş dıdın ser gelan
Mırovhez û demoqratan
Mina guran
Mina haran
Bırano, hevalıno
Werın em destan bı hevdın
Bıbın yek, bıbın yek
Bıbın kulmek, bıbın devek
Lı nav gelan de ṫakın
Sinor û pasaportan
Nemine şer û pevçûn
Mırov bı destê mırov neye kuştın
Nerıje xwin
Werın bırano
Werın, werın hevalno
Jı bona rojek baş
Demek xweş
Jı bona nan û xwarınek paqıj
Kınceki nû û
Jiyanek qenc û baş

Jı bona zarokên pıçûk
Ew zarokên xas û tazi
Ti û bırçi
Ewên zık werımi
Çêq mina pêçi
  Ewên bêt bıjijk û derman
  Bêt zanin û dıbistan
  Bêt derpe û fistan
Bınhêrın bırano
Bınhêr ey kurê mırov
Hêstêrên bav û dayikan
Bûne mina avên kani û çeman
Dıherıke lı ser rûyan
Jiyana jınan
Ên keç û bûkan
Lı nav dewar û pezan
Zılb û rıxan
  Werın bırano
  Werın, werın hevalno
  Werın em sazkın Kurdıstan
  Êdi gelên mazlûm nemının
  Nemının lı bın destan
Werın jı bona bıratiyê
Jı bona hevaltiyê
Dıvê êdi em nebının yek têr
Yek bırçi
Sazbıkın cihanek wekhevi
Cihanek bırati
Nemine bındesti,
Berdesti û xulamti.
8-1-1982

## JI GIRTİYÊN KURDAN RA
## "DILORİNIM"

Lıngên xasi ser erda şıl
Zık bırçine tune kınc, cıl
Bo rewşa wan ez bûm bılbıl
Xem dıkşinım dılorinım

Lı Amedê, lı Xarpıtê
Lı Şırnaqê, lı Xozatê
Kurd bûne dil Mêrdin, Sêrtê
Bo dilên Kurd dılorinım

Ew dıkşinın zılma dıjmın
Ar ketiye kezewa mın
Pêşmergeno bırayên mın
Jı bo we ez dılorinım

Zindanan de keç, xort û jın
Rewşa wan tê ber çavên mın
Ew bırane, ew xwişkên mın
Ez bona wan dılorinım

Rızê Gunım, zef xem dıkım
Sılavan wanra rêdıkım
Lı ser doza wan şer dıkım
Bo Kurdıstan dılorinım.

8-4-1982

## MEGİRE DAYÊ

Em lı welat derketıne
Dê û bavan dûrketıne
Ev hesret dıjwar, çetıne
Megire dayê, megire

Qom û qebil xwişk û bıra
Dûrketım ez hatım vıra
Qet pırs mekın mebên çıra
Megire dayê, megire

Dar û ber, kevırên welat
Lı Sydney de bira mın hat
Kurdıstana mına cenet
Megire dayê, megire

Em lı ber zılma neyaran
Derketın hatın van deran
Welat birnabe çu caran
Megire dayê, megire

Rızê kurê te xemgine
Ciger kule, dılda şine
Axina welêt dıkşine
Megire dayê, megire.

8-25-1982

## BİRA MIN HAT

Ew delala mına çav reş
Çıl du sale, mın ew nedit
Kereng, sıpıng, xilok, zebeş
Mın tama wan lı vır nedit

Lı qurbetê dılkesenm
Ez bêt welat, ez bêt wanm
Wek sêwiyên ber diwanm
Rojek a xweş mın qet nedit

Gul sosınên serê çiyan
Xew pırr xweşe lı bın siyan
Hat bira mın berên tûyan
Mın tama tû lı vır nedit

Ew kaniyên deşt û kortan
Pez avdıdan keç û xortan
Lı zozanên Cızra Botan
Zozan, kani, mın vır nedit

Kurdıstane welatê mın
Bina wê tê ber pozê mın
Ev hesret daxkır dılê mın
Dıl dıgire, welat nedit

Rızê Gunm ez dıl kulım
Bo doza welêt bılbılım
Kezew şewat ez çav şılım
Ken û şahi mın qet nedit.

24-10-1982

## DIVÊ EM RABIN

Dıvê em rabın serxwe
Dıjmınan bıdın berxwe
Êriş bıkın wek şêran
Rızgar kın welatê xwe

İro sedsala bistan
Disa em lı bın destan
Şerm, fediye jı mera
Bın destan de Kurdıstan

Êdi bes bındesti
Kêr goşt ket, gihişt hesti
Gelê Kurd kırın xulam
Ramanên Olperesti

Rızê Guran bang dıke
Dılşewat axin dıke
Kurdıstan wê azad be
Dıl lı ev bawer dıke

1O-3-1983

## HÊVİYA DAYİKÊ

Ez dıgirım, dılşewatım
Jı ber ku ez bêt welatım
Ez bengiyê azadi me
Mem û Zinım, ez Ferhatım

Ez Medyame, ez Kardûkım
Berf û baran, ba û pûkım
Sıpan, Nemrût, Araratım
Lı cihan de, ez dirokım

Rojhılata Navin de ez
Bo rızgari gavan bı lez
Davêjım day, kes nabe hêz
Tenê mame, bêkesım ez

Hezar salın, ku dınalım
Ez kani û çem newalım
Ez bêt warım, ez bêt alım
Bın destan de Kurdıstanım

Gund, bajarên mın standın
Qedexe bû zıman xwendın
Sê dıjmınên bêt ram û har
Gul û sosın çılmışandın

Ne pêlhêze, ne dıbistan
Ev şerma qurne a bistan
Ez bawerım newiyên me
Wê felat kın lı bın destan.

## TÊN BER ÇAVÊN MIN

Ew çiya û zozan, erdê Kurdıstanê
Tên ber çavên mın, tên ber çavên mın
Lı welêt dûr dıjim, ahx dayê, dayê
Ew erdên welêt tên ber çavên mın

Welat ketiye bın destên dıjmın
Zar û zêç bırçi, beden jar çermın
Qet tune vejen, mal sar, ne germın
Ew rewşa malan tên ber çavên mın

Ew çem û kani, ew avên zelal
Zinar û çiya, kendal û newal
Reyhan û Sosın, nêrgızên delal
Bihn û rengên wan tên ber çavên mın

Deşta Haran û Sıpan, Ararat
Mınzûr û Mûrad, Xarçik û Fırat
Bı xwinê avdan, ew erdên welat
Ew axên reng xwin tên ber çavên mın

Rızê Guranım, hesreta welat
Dıkşinım, dayik nebûye felat
Bıbinım bımrım, jı mınra xelat
Ew xem û xeyal tên ber çavên mın.

7-1O-1984

## JI BO WELAT

Ez dılbırin, ez dılêşım
Jı bo welat, jı bo welat
Aqıl nema ez bêt hışım
Jı bo welat, jı bo welat

Lı dayikê ez dûr dıjim
Jı bona ev kerr û gêjım
Derd kulên xwe dıbêjım
Jı bo welat, jı bo welat

Dılbırine Rızê Guran
Bo hesreta gel û bıran
Rê lı mın qutkır neyaran
Jı bo welat, jı bo welat.

29-1O-198

## REWŞA KURDAN

Top û qırşûn pırr dıbarın
Lı ser Kurdan, lı ser Kurdan
Sê dıjmının, sê neyarın
Jı bo Kurdan, jı bo Kurdan

Ew dıkujın pir û kalan
Xwina Kurd wek çem newalan
Dıhenke hezar salan
Kes nabine rewşa Kurdan

Gelên cihan çav kor bûne
Kes naxwazi Kurd bıbine
Zarok sêwi, bav mırine
Kes nabine şina Kurdan

Çav berdane namûsa me
Qıjêj dıkın keç bûkên me
Dergûşan de zarokên me
Têne kuştın zarên Kurdan

Êdi bese, êdi bese
Bıgır Kurdo çekûç dase
Rızê Gur dılda nexwaşe
Bo Kurdıstan, jı bo Kurdan.

28-11-1984

## GELÊ HEJAR

Dıjmın disa êriş dıke
Dıçe ser netewek hejar
Top û tıfing xudan çeke
Dıkuje ew gelê hejar

Kurd xudanê çar dıjmınan
Çar kesan de tune wıcdan
Wana vala ditiye meydan
Dıkujın ew gelê hejar

Sê nıjadên har teresın
Tırk û Ereb û Farıs'ın
Bo doza Kurd pırr dıtırsın
Dıkujın ew gelê hejar

Rızê Guran havıl çiye?
Havıl ev e yekitiye
Ew tune dıjmın ditiye
Dıkuje ew Kurdên hejar.

29-11-198

# JI BONA MIRINA MAMOSTE CİGERXWİN
-1984-

"Ronahi lı pey tariye
Tım roje lı pey şev"
Ev gotına a teye seyda
Xewa kûrda tu rakev

Tu namıri dılan de
Dıji, dıji şev û roj
Te milyon fidan danin
Kurdıstan de bûne aj

Şev û roj mezın dıbın
Jı ber ku te ew av dan
Çavên te payi neçın
Bıbın mina te şervan

Ala kesk û sor û zer
Te rakırıbû destan
Tu nav nûr de qenc raze
Wê rızgar be Kurdıstan

Mırına te mamoste
Em kuştın em helandın
Dıvê ser tırba teda
Tipên zêr bên nıvisandın

Carek di disa dıbêm
Tu birnabi çu caran
Çav şıl û dılbırine
Jı bo te Rızê Guran.

14-2-1984

## XEYAL

Rûnıştıbûm lı odê
Ez mabûm tenê
Ketıbûm nav xem, xeyalan
Çûbûm kurdıstanê
  Seri çiyan berf bû
  Berf belek, belek
  Çemên Kurdıstan bûbûn behr
  Hemû rê gırtıbûn Felek
Disa pırd tunebûn
Rewş mina beri
Disa ga û hevcar
Tev barê kehrê
  Kerimê Kelekvan
  Kelek dabû ser çem
  Ez mabûm bêt hış
  Ez mabûm bêt fêm
Gel bı tırs sıwar dıbû
Ketıbûn nav xem û xof
Kalan cıxare dıkışand
Dıkırıne kufe kuf
  Gazi Xwedê dıkırın
  Dıgotın"ya heq, ya Xızır
  Me derbazke lı ev çem
  Tu her der hazır, nazır"
Cotkaran cot dıajotın
Dıgotın"ho-ho, ho-ho"
Karê gundiyan ew bûn
Hım bı şev û hım bı ro

Dawiya xetê cotkaran
Gisın paqıj dıkırın
Pêştemal dabûn pêş xwe
Zevi toxım dıkırın
Kewaniyan dew dıkan
Dıhat tap-tapa meşkan
Kalandına berx karan
Dengê dik û mırişkan
Dem bervı havin dıçû
Vebûbûn gul, gulıstan
Nêrgız, Sosın Belgizar
Xweş bihn dıda Kurdıstan
Ez nıhêriyam dora xwe
Mın mêzekır rêwanan
Rêwan jın, pir û kal bûn
Lı tev kehran, lı tev gan
Gundan de xort nema bûn
Welat tev bûbû wêran
Tori, rovi her pırbûn
Lı ser erdê Fil, şêran
Dıjmın namûsa Kurdan
Kırıbûn bın lep û destan
Şêlandıbûn gund bajar
Qet nemabûn bax bostan
Ew leşkerên Roma Reş
Ketıbûn war û malan
Dıkuştın xort, mêr û jın
Mal ji dıkırın talan

Reviyabûn hın keç, xort
Derketıbûn ser çiyan
Şıkeftan de dıjiyan
Jehr, axû, bûbû jiyan
  Bı hezaran xort û mêr
  Bûbûn dilê dıjmınan
  Wana canê xwe dabûn
  Ber êşkence, lêdanan
Wan dılsozan, mêrxwasan
Qet sır nedıdan dıjmın
Lı ber ço û êşkencan
Nedıgotın"ax lı mın"
  Lı nav ew teşqelan de
  Ez ketım nav gund, goman
  Dengê tıfingan dıhat
  Dılê mın ket nav xeman
Mın dit ku leşkerên hov
Wek çêl'kewan dırevın
Dest Kurdan de çek tıfing
Qenc şer dıkın mêr û jın
  Dabûn pêş xwe Tırkên har
  Dıpekandın, dıkuştın
  Dılê mın gelek şabû
  Dıhat gırtın tol û xwin
Lı nav ew evinê de
Ez bûm teyrek fıriyam
Derketım ser kaş, çiyan
Bı şabûnê, giriyam

Dûra bı lez daketım
Ketım nav refên bıran
Lı wê ez bûm pêşmerge
Mın cih gırt lı nav şêran

Jı bona serketınê
Şahi, dilan destpêkır
Def, zurne hatın ba hev
Gelê Kurd zef dılşakır
Yekser lı xwe hesiyam
Bûm dılkeser, dıl xemgin
Ew rewş ber çav de neçû
Ez giriyam, mın kır şin.

2-3-1985

## GILİYÊN PÊNÛSÊ

Pênûs lı dest mın de, ew ji dıgiri
Ew ji bûye çav şıl, dılkeser xemgin
Dıbêje ma çıra Kurd mane bındest?
Bıla rakın Ala çar reng û rengin

Lı dest raymezınan de, ez bûme liztok
Lê xwediyê mım lı mım xwedi derneket
Hostayê mın karker, raymezın dızok
Ez keda karkerım, ew xwedi derket

Jı bo ev xemginım, mame bêt xwedi
Naxwazım lı destê kedxwar de bıjim
Nav tıliyên karker de, bı ken dılşadi
Bıxebıtım her dem, ez werge bıjim

Dıbêm bese êdi jı hostayên xwera
Naxwazım bıgirım, ez daynım şini
Zımanê mın tune, ez yarım tera
Dıvê tu ev rewşê bı xwe bıbini

Boyaxa devê mın hostan ra ferman
Derdıxine, dıbe bın dar sêpiyan
Karên raymezınan odan de karmen
Dıvê karker jı xwera bıbe sermiyan.

1O-3-1985

MEMÊ ŞIVAN

Keçek azew û bedew
Lı pêş deri dıka dew

Dit ku xorteki cıwan
Hat mala wan bû mivan

Keçıkê bazda hındır
Meşka dew jı xwera bır

Dê û bavê keçıkê
Gotın"dayne tu meşkê

Zûke dewê xwe dake
Feroqan lı vır rake

Bıçe porê xwe şeke
Kıncên xwe'ên nû xweke

Şuva were gel mivan
De lezke bavêj gavan

Mivan ra bin nan û dew
Fedi meke tu merev"

Ew keçıkê por şehkır
Kıncên xwe'ên nû xwe kır

Çû kilarê nan ani
Bır lı pêş mivan dani

Mivan nan xwar mêzekır
Keçıkê ra qıse kır

Got"bı dılda zor spas
Te şıkyane kınc libas"

Keçık keniya dılşa bû
Kasa vala rakır çû

Pey xwarınê xort rabû
Xwatır xwast û bı lez çû

Dageriya gundê xwe
Ew mızgin da diya xwe

Got"day mın keçıkek dit
Sıtiyek bedew egit

Bıçın mınra bıxwazın
Ez ji bıbım xudan jın"

Dayik zû çû gel bavê
Ku lez bavêje gavê

Beri balyozek şandın
Roj û dem, wext pêdandın

Heftek dûra xwazgini
Dê bavan nişan dani

Pênc, şeş mehe derbaz bûn
Mûmên dawat belav bûn

Nanê dawatê patın
Def û zurnevan hatın

Dilaniyê destpêkır
Xort û keçan dılşakır

Xort, keç, ketın destên hev
Reqısiyan roj û şev

Kıncên keçan rengin bûn
Lıng kondıre solmes bûn

Pani erdê dıxıstın
Bı hevra dıleyiztın

Nav de sê roj derbaz bûn
Bûk sıwar bû lı gund çûn

Şoşpan û zava rabûn
Ser xêni amade bûn

Kırın dest xwe sêvên sor
Bûk ser hespê, ewên jor

Sêv avıtın kum û fes
Bûkê zor dıgırt nefes

Bûk ser hespê anin jêr
Lı wê neman xort û mêr

Kevçiyek lı lıng xıstın
Paş perdê cıl raxıstın

Berbûk zû derkete der
Lı hev şabûn du nefer

Ew ketın hembêza hev
Zû sıbe bû nema şev

Lıgel hev man bı salan
Ew gundê Depê"Xelan"

Heyam zû-zû derbaz bû
Nav zeman de heft sal çû

Ew bûn xudan du kuran
Xêrnexwaz, xısım ciran

Yek heft salin, yek pıtık
Herdu ji bedew rındık

Mêr û jın evindar bûn
Ew bı hevra zef yar bûn

Roj û meh derbaz dıbûn
Ew zarok mezın dıbûn

Rojeki bav nexwaş ket
Derdek jı wira derket

Ne bıjijk bû, ne derman
Xwedê dabû ew ferman

Hefteki de bav mır çû
Dayik bêt star mabû

Ew herdu kur man sêwi
Jınık bêt mêr, mabû bi

Dayikê dani şini
Lı jiyanê nekeni

Wê şev û roj kardıkır
Kurên xwe xwedi dıkır

Lê meri û menıstan
Ne parik nan, ne fistan

Qet nedıdan bûka xwe
Birkınbûn erka xwe

Nedıgotın bûka me
Were rûne lı ba me

Zıvıstanê destpêkır
Berfê xwe lı erdê kır

Bın xani de jına bi
Kesek wêra nebû si

Hewa sar bû ba dıhat
Ber sêlê de nan dıpat

Nanê xwe pat mal rûnışt
Dûra pışta xêni mışt

Dit ku nabe ew jiyan
Jêra her teng bû cihan

Gazi kurê mezın kır
Ramana xwe beyan kır

Got"dıvê em derkevın
Sıbe rabın rêkevın

Bıçım mala bavê xwe
Lı wê şakım dılê xwe"

Salên kurê mezın heft
Xani sarbû wek şıkeft

Hemû mabûn stuxwar
Kesek wanra nebû yar

Rojtıra dın sıbê de
Zû xew rabûn cılê de

Kurê pıçûk hembêz kır
Piçek mêjand zık têr kır

Amade bûn derketın
Mal cihiştın rêketın

Dayik lı tev du kuran
Dıhat dengê seg, guran

Hewa sar bû berf û pûk
Qemıryabûn çem û cok

Lı pêş wan de çem hebû
Ba, bahoz hewa mıj bû

Kurê mezın nav Sım bû
Ê pıçûk ji nav Mem bû

Gihiştın Korta Laçê
Berf tozık dıket rêçê

Ew jınık tev du kuran
Rê gırtın refên guran

Dayik lı tev kurê çûk
Lı nav berfê, lı nav pûk

Derket ser dara Mazi
Kır qirin û kır gazi

Sımê reben xwe şaş kır
Bazda bın dar, şenekır

Gur gihiştın ba Sımê
Perçe kırın ew demê

Hemû goştên wi xwarın
Dê û bıra ser darın

Qirin û gazina wan
Derket hatın nêçirvan

Mem, dayik felat kırın
Ava çem derbaz kırın

Dayikê dıkır hawar
Xwedê jêra nebû yar

Berê xwe da Coşıkê
Derbaz bû nav Riçıkê

Çû gihişt mala bavê
Şini ket mal ew şevê

Bı rojan şini, giri
Şuva nedıhat mıri

Hêdi-hêdi derd bir bûn
Sal û mehe hatın çûn

Nav de rabırt nehe sal
Dayik bı derd zû bû kal

Rojek ew ji nexwaş ket
Ruh bedenê de derket

Êdi dayik ji nema
Memê reben sêwi ma

Rewşa Memê bûbû zor
Leqeba wi danin"Gur"

Mem bû ew Memê Guran
Wer hat nasin her deran

Lı pışti ew neh salan
Wi cihişt mala xalan

Çû Mastanê bû şıvan
Xebıti roj û şevan

Bû şıvanê Gêdûk'an
Dıçû ber kar, golıkan

Gêdûk Axa, Mem hezkır
Mem lıgel xwe mezın kır

Dûra bırçibûnek hat
Xem derdên gel bûn qat-qat

Axa gazi Memê kır
Şand Nazmiyê ew rêkır

Got"zû bıçe Memê mın
Gûlık bıçın bine mın"

Memê çû Gûlık çıni
Çal tıji kır wi ani

Gûlık radest axa kır
Axa gund de belav kır

Gundiyan dıwa kırın
Bı Gûlık zık têr kırın

Ew giyayê Gûlıkê
Mem kır nasê Kûpıkê

Mem lı Mastanê rabû
Çû Kûpıkê cıwar bû

Bo colegê seyidan
Xısmên xwe nebû xudan

Mem zewıci dıl şakır
Abora xwe her qenc kır

Ew bû xudan çar kuran
Ew mal bû mala GURAN.

18-3-1985

## MA ÇI FERQ HEYE?

Yek bejn kıne, yek dırêj
Yek bıaqıl, yek ji gêj
Yek hozane, yek dengbêj
Ma çı ferqa van heye?

Yek nezane, yek pıspor
Yek karkere, yek toxtor
Yek lı jêre, yek lı jor
Ma çı ferqa van heye?

Yek mıhendis, yek şıvan
Yek mamoste, yek gavan
Yek wali, yek dergevan
Ma çı ferqa van heye?

Yek garsone, yek barmen
Yek paqıjvan, yek karmen
Yek şerûd, yek centılmen
Ma çı ferqa van heye?

Yek cotkare, yek pale
Yek cıwane, yek kale
Yek derva, yek lı male
Ma çı ferqa van heye?

Yek zık têre, yek bırçi
Yek bêt Ol e, yek heci
Yek bêt jın, yek zewıci
Ma çı ferqa van heye?

Yek ajotvan, yek vatman
Yek sıtvane, yek qaptan
Yek lı Çin, yek lı Botan
Ma çı ferqa van heye?

Yek axaye, yek aşvan
Yek aşitixwaz, yek şervan
Yek nav Mao, yek Mervan
Ma çı ferqa van heye?

Yek gundiye, yek wezir
Yek paşaye, yek ji mir
Yek bodleye, yek ji jir
Ma çı ferqa van heye?

Yek reşıke, yek ji zer
Yek azade, yek noker
Yek çav kore, yek rêber
Ma çı ferqa van heye?

Yek xoceye, yek derwêş
Yek bı kêfe, yek dılêş
Yek şuvaye, yek lı pêş
Ma çı ferqa van heye?

Yek Samiye, yek Ari
Yek Coniye, Yek Nûri
Yek Tırke, yek Asûri
Ma çı ferqa van heye?

Yek Turkere, yek Azad
Yek Turkane, yek Dılşad
Yek Sokrat, yek Mıhamed
Ma çı ferqa van heye?

Yek cebare, yek goşkar
Yek kar dıke, yek bêt kar
Yek marbıri, yek bêmar
Ma çı ferqa van hey

Ki têre, ki bırçiye
Ki taziye, ki tiye
Mırov reşe, sıpiye
Ma çı ferqa van heye?

Hemû canın, mırovın
Hım bıaqıl, hım hovın
Bın esman û bın tavın
Ma çı ferqa van heye?

Madde, bıoloji yek
Çı Xwedê ye, çı Felek?
Herkes dımıre carek
Ma çı ferqa van heye?

Du çav, du guh, yek ji dev
Hemû mırov mina hev
Tım roj dıçe lı pey şev
Bınhêr, bıbin, çı heye

ewa û xwarın û av
Bo herkesi roj û şev
Dıvê heq bıbe wek hev
Ku jin bêt dad nemine.

25-3-1985

## NEWROZ

Bist û yekê Adarê
Ew roj cejna Kurdane
Hım destpêka bıharê
Ew sersala Kurdane

Navê ew rojê Newroz
Ew evrare, ew piroz
Jı Kurdan ra cejn û doz
Bûye, Ala Kurdane

Cejna hezar salane
Evina pir kalane
Bengiya keç xortane
Delala me Kurdane

Mıricana Kurdane
Çek û şûrê merdane
Kurdan bo wê ser dane
Ew diroka Kurdane

Qıralki Asûr hebû
Ew qırala Dehaq bû
Xwinmıjeki neheq bû
Ew neyarê Kurdane

Lı ser mılên wi du kul
Derketın, jan kıre dıl
Remilvanan dan aqıl
Jı bo serê Kurdane

Remilvanên har Şeytan
Gotın"qıral tu şertan
Bıne cih, bıkuj xortan"
Kuştın jı bo Kurdane

Ew xort û Kurdên cıwan
Serjêdıbûn wek heywan
Mêjo Dehaq ra derman
Dıbû, şina Kurdane

Tekoşerê xebatkar
Ew Kawa ê hesınkar
Çend kurên wi Dehaq xwar
Bir nabe bo Kurdane

Kawa hewl da roj û şev
Gelê Ari dest da hev
Bûn yek beden, bûn yek dev
Ew şan, şana Kurdane

Ew roj û demên tari
Qurban bûn gelek seri
Hember zılmê berberi
Cih gırt lı nav Kurdane

Gel rabûn şûr gırêdan
Sımbêlên reş wan badan
Lı xwe bı xwe bûn xudan
Ew xurışta Kurdane

Şên û geş bû ew tevger
Gel ferman gırt derket der
Bı dıl û can ketın şer
Şer hunera Kurdane

Keç û jın ji tev mêran
Ew ketın şer wek şêran
Dıjmın dıdan ber şûran
Şana jınên Kurdane

Pêş tevgerê Kawa bû
Wi Dehaq kuşt gel şabû
Ew roj bo Kurd bimebû
Biranina Kurdane

Ew sazûman qedandın
Kela Dehaq şewtandın
Seri wi pelçıqandın
Ew kar, karê Kurdane

Herkes rûken dıl şabûn
Lı Ninewê Kurd kombûn
Kawa tac da Fêridûn
Ew kalıkê Kurdane

Fêridûn newiyê Cemşit
Ew mêrxwas bû, ew egit
Xudan dad bû, gel ew dit
Ew rûmeta Kurdane

De rabe bıra rabe
Xudan war û dewlet be
Newroza we piroz be
Rıza kurê Kurdane.

28-3-, 985

## JI DAYİKÊRA

Ew evine, ew delale
Tazi, bırçi kurên wê ne
Bın destan de hezar sale
Ew qeder û bextê wê ne

Çiya, kani, war û zozan
Gul çılmışin, zevi xozan
Bûn, gur ketın nav kar, pezan
Ew kar û pez malên wê ne

Erdê daykê talan kırın
Zarokên wê bêt bav kırın
Gel şêlandın xızan kırın
Derd û kul û êşên wê ne

Sıpan û Nemrût, Ararat
Dicle, Mınzûr, Mûrad, Fırat
Rustemê Zal, Şirin, Ferhat
Erd, çem û zarokên wê ne

Ew evina Mem û Zine
Ketiye bındest, zef dılşine
Wek Xani, wek Cigerxwine
Mele, Feqi kurên wê ne

Navê diya mın Kurdıstan
Gul û kulilk û gulıstan
Sosın, Nêrgız, bax û bostan
Lı ser sing û canê wê ne

Kureki wê Rızê Gure
Dılbirine, dılagıre
Dayik şirine, şekıre
Tamên şirin, tamên wê ne.

18-8-1985

Jı bona biranina yek salina mınna
mamoste Cigerxwin û Yılmaz Guney

"BİRNABIN 22-8-1985"

Birnabe Yılmaz
Birnabe Seyda
Ew lı dılan de dıjin
Lı dılên meda


Bı hezaran sal
Derbazbın disa
Birnabın ew herdu
Tên biranin usa

Ew ronahine
Mina Roja Zer
Jı gelra şewqın
Tari davên der

Şiyar û rêberên gelın ew
Rêşanên mene
Çiyayên bılındın
Ew Ala mene

Nazım Hikmetê Kurd
Seyda Cigerxwin
Mınna te Kurd kırın
Dılêş, dılbirin





Tu Nerûda'ê meyi
Mina Pûşkini
Te şer domdıkır
Ser rêça çini

Tu hozan, dirokzan
Yılmal Rejisor
Mêrxwasên Kurdın
Hûn herdu pıspor

Tu û Yılmaz Guney
Hûn qet bimabın
İro roja mırına weye
Kurd çawa şabın?

Kurdperwer xemginın
Bo we dılşinın
Rızê Guranım dıbêjım
Hûn lı nav nûr de bıminın.

10-11-1985

## BERİ HER TIŞT MIROVIM

Ez ne hovım, ne ji din
Beri her tışt mırovım
Du çav, du guh, neh mehin
Ez bedenek û canım

Mırov hemû bırane
Jı ber ku yek hevirın
Cihan de belav bûne
Ne ku dar û kevırın

Zıman cûre, cûre ne
Lewra jı hev dûr dıjin
Navda derya, çiyane
Usa çêbûye ev jin

Ez dıbêm hemû mırov
Dıvê bıjin wekhevi
Nemine şer û kuştın
Mırov bêtırs rakevi

Mırov zer, sıpi, reşe
Ma kıramet çermdaye?
Mırov, mırove bese
Mêjo, aqıl serdaye

Xêrnexwazên ev cihan
Hevra dıbın hevalbend
Şer, pevçûn derdıxinın
Gel nabine ev dubend

Bırçi, tazi, lıng xasın
Disa dıjmınên hevın
Bêt derman û nexwaşın
Mina koran bêt çavın

Lê nızanım ev rewşa
Heya çı wext domdıke?
Yek hejare, yek paşa
Ki ev ferqê radıke?

Hemû hejarên cihan
Mafê we hemû yeke
Bı karên xwe sermiyan
Bıbın, wera ew heqe

Lı nav xwe de hûn rakın
Pasaport û sinoran
Bıbın heval dılşakın
Fersend medın neyaran

Nemine kuştın û şer
Hevra bıbın hûn bıra
Bıbın mina bedenek
Vêxinın şewq û çıra

Bıbın xudanê Xweza
Kıfş bıkın erd û esman
Nemine sûc û ceza
Çêkın mırın ra derman

Dıjmınati, tevkuştın
Dıvê dirok de rabe
Çek, sileh neyên hiştın
Ku dılê Xwedê şabe

Nav mêran û jınan de
Dubendiyan bavên der
Yek bave, yek ji dayik
Hevra bıjin bırader

Cihan de Aşiti sazkın
Ku Rızê Gur dılşabe
Hemû bıjin wekhevi
Ma çı reş, çiye sıpi?. .

19-1O-1985

## CANÊ CANÊ

Dınali bın zılm û zorê
Bı saxi ketiye gorê
Dıjmınan xwe daye dorê
Wenda kır'ye wê hêza xwe
  Canê, canê, canê, canê
  Canê, canê Kurdıstanê

Cane rewşa te dıjware
Tu dilgırti zindan sare
Dıjmın zalım gurê hare
Tu kıri bın lıng, lepên xwe
  Canê, canê, canê, canê
  Canê, canê Kurdıstanê

Canê ez hesreta teme
Dara keski, aja teme
Lı cihan de kurê teme
Bıxwaz bıdım te canê xwe
  Canê canê, canê, canê
  Canê, canê Kurdıstanê

Canê, canê tu canê mın
Jiyana mın, tu ruhê mın
Evina mın, hêviya mın
Jı bo te bıdım canê xwe
  Canê, canê, canê canê
  Canê, canê Kurdıstanê

Canê derd, pırsa te gıran
Tu fırotın şêx û miran
Bo te dılşin Rızê Guran
Rız bıde te ruh canê xwe
  Canê, canê, canê, canê
  Canê, canê Kurdıstanê.

27-3-1986

## TU ŞİRİNİ

Delal tu tam û şirini
Ciger kuli, dıl birini
Jı bo kula te em derman
Bıbinın ew derd nemini
  Tu evini, tu delal
  Ava paki, zef zelali

Tu çem û çiya kaniyi
Mele, Feqi, tu Xani'yi
Tu ax a Kardûk û Gûti
Kurd ra hêvi, mal baniyi
  Tu evini, tu delali
  Ava sari, pırr zelali

Tu Nêrgız û Gul gulıstan
Bınevş, Sosın, bax û bostan
Bın lıngan de pırr dınali
Ez qurbana te Kurdıstan
  Tu evini, tu delali
  Ava sari, pırr zelali

Kurd kurê te, kurê Medın
Gernas, egit, mêrxwas merdın
Rızê Guran dılda dıbê
Dıvê em canê xwe tedın
  Tu evini, tu delali
  Ava sari, zef zelali.

17-4-1986

## KEDXWARÊN TERES

Pırr geriyam mın dit neheqi, qenci
Lı cihan de dıjin, zer, sıpi zengi
Ez şaş û metal mam, bo karên mırov
Dıj hev dıxebıtın, qenci naye ci

Lı bın esmanê şin, bın Roja Zeri
Lı nav ev gerdûn de, mırov wek keri
Kar dıke, dıgere, çêdıke her tışt
Aşiti, wekhevi qet nabe seri

Jiyana mırov, du roj, sê rojın
Reben xewdane, razan binojın
Kedxwar naxwazın hejar şiyarbın
Zametkêşên cihan, hevdu dıkujın

İro em hene, sıbe em dıçın
Kes nebêje ezım, em hemû hêçın
Mêrani û qenci dımine elbet
Roj tê mırov dımıre, kefen dıpêçın

Rızê Guranım, mın ditın pırr kes
Kar û xebat dıkın, bı dıl û hewes
Lê disa bırçine, disa ji tazi
Heqên wan dıxwın, kedxwarın teres.

2-9-1988

## NAMEK JI DAYİKÊ RA BAWER BÛME

Dayê lı te dûrketıme
Zanmeke ez raketime
Şev û roj hesreta teda
Dıl nexwaşım ez kal bûme

Dıjmın em hev cûda kırın
Mal mılkên me talan kırın
Welat perçe-perçe kırın
Ez bêt erd û bêt ax bûme

Newiyên te mezın dıkım
Her roj, her dem şiret dıkım
Dıjmın lı wan nişan dıkım
Te felat kın bawer bûme

Dayê ew roj pırr dûr nine
Bo azadi Kurd bırçine
Mina şêr, pılıngên tine
Êriş bıkın bawer bûme

Newiyên te ew nav Kurdın
Mezın dıbın, cıwan merdın
Jı bo te canê xwe bıdın
Ew roj nêzık bawer bûme

Rûnıştıne dıjmın ser te
Qırêj dıkın bedena te
Kurd bıgırın tol hêfa te
İro sıbe bawer bûme.

26-6-1989

## DE RABE KURDO

Cihan ser esman tu xew de mayi
De rabe Kurdo, tu rabe serxwe
Bıbın Roja Zer, esmanê sayi
De rabe Kurdo, tu rabe serxwe

Dıjmınan welat tevda gırtıne
Kınne çar perçe parvekınne
Ser erd û bın erd talan kınne
De rabe Kurdo, tu rabe serxwe

Jı gelê xwera şêr û pılıngi
Dıjmın namûs gırt çıra bêdengi?
Dıbêji"ez Tırkım"çıqas bêt rengi
De rabe Kurdo, tu rabe serxwe

Namûsa evrar xwişk û jın nine
Welat, çand, zıman ew'ên ewline
Çavên xwe veke rasti bıbine
De rabe Kurdo, tu rabe serxwe

Jı xwe birmeke tu kurê Medi
Namûs bındeste jı tera fedi
Canê xwe bıdi, dıvê ew nedi
De rabe kurdo, tu rabe serxwe

Dıjmın namûs gırt çıra dınhêri?
Jı gelê xwera lehengi, şêri
Pêş dıjmın tırsonek, tu stuxwari
De rabe Kurdo, tu rabe serxwe

Lı ser namûsê neyar rûnıştın
Çand, awaz dızyan, tıştek nehiştın
Bı sed hezaran gelê te kuştın
De rabe Kurdo, tu rabe serxwe

Çiya gêr dıbın bıbine lo, lo
Helepçe-Hiroşim, çiya Qasımlo
Dıjmın kine naske Hes, Huso, Alo
De rabe Kurdo, tu rabe serxwe

Gazi te dıke Rızo ê Guran
Tori ketıne ser erdê şêran
Toriyan derxin, tu mina mêran
De rabe Kurdo, tu rabe serxwe.

5-8-1989

## OY DAYÊ

Dayê ez dıldax, dılşinım
Hıstrên çavan dırıjinım
Derd û kulan pırr dıkşinım
Her roj, her dem te birtinım
  Oy dayê, dayê, dayê
  Stuxwarê bêkes mayê
  Oy bıra, bıra, bıra
  Em bındestın çıra, çıra?

Dayka mına nav Kurdıstan
Dıjmın pırr bûn ket bın destan
Tazi kırın ma bêt fistan
Şêlandın hemû bax, bostan
  Oy dayê, dayê, dayê
  Stuxwarê bêkes mayê
  Oy bıra, bıra, bıra
  Em bındestın bêje çıra?

Dıvê êdi em şiyarbın
Bı hevra dost û yarbın
Lı ser erdên xwe cıwarbın
Xudan ax û xudan karbın
  Oy dayê, dayê, dayê
  Stuxwarê bêkes mayê
  Oy bıra, bıra, bıra
  Em bındestın çıra, çıra?

Dayê şerkım, şerkım, şerkım
Lıngên dıjmın ser te rakım
Te felatkım, dılan şakım
Ala rengin bılınd bakım
  Oy dayê, dayê, dayê
  Stuxwarê bêkes mayê
  Oy bıra, bıra, bıra
  Em bındestın, çıra, çıra?. .

10-7-1989

## BESE KOR MEBE

Bıra tu rabe lı xewa kûrda
Mıxabe jı tera, tu binoj mebe
Bo doza welêt hezaran can da
Birbin, zanıbe, bese kor mebe

Du çav û du guh, ên te ji hene
Bıbin guhdar ke, dıjmın ew kine?
Bı milyonan gelê te bırçi û tine
Bıbine ew rewşê, tu bêt hış mebe

Lı neynıkê bınhêr, tu mina şêri
Xulami zor şerme, lo tu ji mêri
Çıra dıjmın ra şıvan, nokeri?
Jı xwe ev pırske, bêt aqıl mebe

Xulami, karê mırovan nine
Çand, zıman qedexe, bınhêr bıbine
Ser bedena dayikê, neyar dıjmıne
Rûnıştiye, bıbin bese kor mebe.

29-7-1989

## NASBIKIN

Şexsperest jı gel ra bûne Kurdperwer
Xwişk bırano hûn wan kesan nasbıkın
Rengê Sıfır zere, nabe Zêr, Gewher
Xwişk bırano hûn zêr, zivan nasbıkın

Jı bona mafên xwe ew dozfıroşın
Dıxwazın gel çêlek be, ku ew bıdoşın
Fıkra gel dıkojın ew, mina kelmêşın
Xwişk bırano hûn kelmêşan nasbıkın

Qırıkên nikul bı gû, bûne elo, baz
Pêş gel dıreqısın, wek qeşmer, canbbaz
Bûne şefên orkestra bed bûye awaz
Xwişk bırano hûn wan şefan nasbıkın

Berjewendiyên wan pêş doza gele
Bêbextiyan dıkın ew çendsed sale
Yekitik tune qet, ew çin nahêle
Xwişk bırano hûn ew çinê nasbıkın

Dıvê em zanıbın, ki dost, ki dıjmın
Raymezın lı jorın, emın jêrzemin
Nav Kurd de hene zef İdi Amin
Xwişk bırano İdi Aminan nasbıkın

Ewın ew bengiyê maf û şexsên xwe
Bı derewan dıxapinın gelê xwe
Gel bındest tê kuştın, ewın kêfa xwe
Xwişk bırano hûn wan kesan nasbıkın

Şirin dıpeyivın, ew gotın gırın
Bı dek û dolavan, pıspor û jirın
Dıbêjın"em zana, axa û mirın"
Xwişk bırano hûn wan miran nasbıkın

Lı ser navê gel, ewın ketıne lec
Derew dınıvisinın dırav dıkın xerc
Dıçın Ewrûpê tên, ew der dıkın hec
Xwişk bırano wan heciyan nasbıkın

Hınek lı wan hene lê qet şerm nakın
Gel kırıne dij hev, hêzan nasnakın
Namûs peymal dıbe, çavan venakın
Xwişk bırano hûn wan koran nasbıkın

Bêt rêz, bêt yekiti, gel rızgar nabın
Mafperest, dozfıroş gel ra yar nabın
Ew neyarên gelın xwinê têr nabın
Xwişk bırano wan xwinmıjan nasbıkın

Rızê Guranım ez, evan dıbinım
Ev rewşê tinım lı ber çav datinım
Şiyarbın beri mırın, ez we bıbinım
Xwişk bırano Kurdperweran nasbıkın.

5-2-199O

## GULA KESK Û SOR ZER

Lı dorbera Dicle, Fırat
Gulek rızya, gula sor bû
Sar û serma lı ser de hat
Ew dıjmınê gula sor bû

Gulê, gulê, gula mınê
Tu evina dılê mınê
Gula mına kesk û sor zer
Bêt av baran ma lı dınê

Pelên gulê çılmışiyan
Daketın ketın nav giyan
Lı ser riyan, lı bın piyan
Canê gulê hemû daxbû

Gul bêt av ma, gul bêt baran
Riçal xwarın mışk û maran
Mar nabın dost qet çu caran
Gul dest maran felat nebû

Gula mına sor Kurdıstan
Rıziya ser çiyan, deştan
Dıjmın ew şıkand bı destan
Kesek gulê ra yar nebû

Gulê gulê, gula mıni
Tu evina dılê mıni
Rıza lı te dûrketiye
Rengê te ê xweş nabini.

10-3-1990

## DÊRSIM WARÊ ŞÊRANE

Dêrsım warê şêrane
Erdê mêrxwas merdane
Zozon, çiya deştên wê
Wek bıhişt û seyrane
  Way Dêrsımê, Dêrsımê
  Em birnekın Dêrsımê
  Heftê hezar gelê Kurd
  Cangori bûn'l Dêrsımê

Mêzgır, Pêrteg û Xozat
Mınzûr, Harçık û Fırat
Waxta ku tên bira mın
Dılê mın dıgre şewat
  Way Dêrsımê, Dêrsımê
  Em birnekın Dêrsımê
  Heftê hezar gelê Kurd
  Cangori bûn'l Dêrsımê

Çemişgezek, Owacık
Nazmiye, Kûpık, Riçık
Lı newalê Laçê de
Mının mezın û qıçık
  Ey Kurdıstan, Kurdıstan
  Em qurbana Kurdıstan
  Welatparêz, Kurdperwer
  Wê felat kın bın destan

Laç, Mameki, Pılemûr
Çal û kort û golên kûr
Hemû ew cih û ew der
Bûn tırbên zarokên hûr
  Ey Şêx sayid, Şêx Sayid
  Leheng, gernas û egit
  Te û İhsan û Rıza
  Roja azad'yê nedit

Mal û xan û aşan de
Şıkeft û bın kaşan de
Gelê Kurd dışewıtandın
Bin derdıket laşan de
  Way Dêrsımê, Dêrsımê
  Em birnekın Dêrsımê
  Heftê hezar gelê Kurd
  Cangori bûn'l Dêrsımê

Qoçkiri û Helebce
Qet lı ber çavan naçe
Bedinan, Şırnaq, Zilan
Dıvê qet lı bir neçe
  Oy Helebce, Bedinan
  Axinek kırın dılan
  Dıvê tol bê standın
  Ev hosiya me kalan.

2-1O-199O

## NALİNA HEZAR SALAN

Dayik bındeste, kûr kûr dınali
Eva nalina çend hezar sali
Dıjmın lıng day ser dayikê lo lo
Ev lıng dayina çend hezar sali

Ew Tırkên Moxol, Ereb û Farıs
Zada me dıxwın, nadın me garıs
Lı stuyê meda, ben, şırit, weris
Ew ben, şırîtên çend hezar sali

Bı rasti ev ji, jı mera şerme
Qet mebên"bexte, Xwedi kerime"
Dıvê em yekbın, dews ser me rabe
Birbıbın zılmên çend hezar sali

Lı mêj de Kurd got"heftê du mılet
Xwedê bıde wan, dûra em felat"
Bo ev xulamti mera bû xelat
Ev diyariya çend hezar sali

Em mırovhezên bı hezar salan
Ev şiret dan me, dayik, bav kalan
Bûye bazınê keç, xort mındalan
Zendan de maye, çend hezar sali

Eva cihan de tenê Kurdan got
Herkes ser nû bû, em man tazi, rût
Ev rewşa xırab dıldax kır, dıl sot
Ev dax û êşa çend hezar sali

Dıvê em bıbên emın em berê
Bese ev raman birbe her derê
Hın kes nızanın Kurd lı kuderê
Dıjin, dıminın çend hezar sali

Vana minakın, şerma cihane
Bındest azad bûn, Kurd tenê mane
Dıjmın dıbın yek, dıdın fermane
Ku neminın Kurdên çend hezar sali

Kurd'no ev bese, xwe bıhêjinın
Olkên nokeri hûn bıçırinın
Daykê azad kın zindan derinın
Nemine zılmên çend hezar sali

Rızê Guranım, ez kurê Kurdım
Lawjenan bêjım navê xwe serdım
Hesret dıldaye xudan kul derdım
Lawje biminın bı hezar sali.

15-11-1990

## SERASTKE XWE

Kurdo bese, Kurdo bese
Bıbine tu dost yarên xwe
Cihan tera teng qefese
Bışekine qefesa xwe

Keko çıra usa dıki?
Dost dıjmınên xwe nasnaki
Yar, neyar hev cûda naki
Bıterikin xurışta xwe

Her tışt lı pêş çavên teye
Kesek nabê Kurd guneye
Bawerke ev sûcê meye
Bese ahengek bıde xwe

Dıvê êdi xwe nasbıki
Gel welatê xwe hezbıki
Hember dıjmın xwe yek bıki
Ku bıbini azadiya xwe

Bınhêre her sê dıjmınan
Tırk û Ereb û Farıs'an
Dıbın yek bo pırsa Kurdan
Qey Kurd nakın yek hêzên xwe?

Diroka me lı wan kevntır
Bejn bala me lı wan çêtır
Bıbêj çiyê me'l wan kêmtır?
Neynıkê de bıbine xwe

Êdi bese ev bındesti
Kêr goşt bıri gihişt hesti
Rıza dıbê bı dırısti
Bıxebıte serastke xwe.

25-11-199O

## REWŞA BER ÇAV

Cihan derket çû ser esman
Lê mıxabe Kurd bındest man

Kurd jı hevra nebûn dılsoz
Qet nedan hev pışt, hêz û soz

Fersend çêbûn, lê kêr nekır
Hêz rûnıştın wan mêze kır

Serok dıjmınan ra bûn yar
Rewş jı gel ra nebû diyar

Jı bo ev ji dıjmın kêr dit
Çar marên reş xwina Kurd mit

Hınekan got"Tûrxût başe"
Kê ji got"na, xelıt şaşe"

Hın serok bûn mina qıral
Bûn hevalê Saddam, Ozal

Dost û dıjmın Kurd hev cûda
Nekır, aqıl bıde xuda

Lê nızanım ez çı bêjım
Rewş tariye seri gêjım

Çermê beraz qet nabe post
Saddam, Ozal ew nabın dost

Refsencani, Hafız Esat
Ew dıjmının, ewın fêsat

Bı çekên dıjmınan welat
Rızgar nabe, nabe felat

Bı dest gıvışt, gep maçkırın
Kurdıstan nay rızgar kırın

Xwedê axıriya Kurdan
Qenc bıke tev Şahê Merdan

Rızê Gurım usa dıbêm
Bınhêrım dawiyê bıpêm.

29-11-1990

## BANGA BIRATİ

Kurdıno,
Destên xwe dırêj kın hev
Bı hevra bıbın yar
Lı ser erdê bav û kalan rakın xwinxwaran
Bışekinın lıng û çêqên dıjmınên neyar
  Bı hevra bıkevın tekoşinan
  Hevra bıkın hevkari
  Sazbıkın Kurdıstanek azad û Serbıxwe
  Sazûmanek wekhevi
  Ku nemine kedxwari
  Welat şên û geş bıkın hûn
  Nemının kesên bırçi
  Dıvê lı ser gel rabe
  Ev zulmat û tari
Bıraki weme, bang we dıkım,
Dıbêm"dıvê usa be"
Hûn hêzên xwe bıkın yek
Bıbın yek can û yek dev
Ku kurdıstan rızgar be
Sılavên bıratiyê jı wera
Newroz'a we piroz be.

"Jı bona Newroz'a 1992"

## GELEK SALIN

Newroz lı nav xwina sor de
Piroz dıbe gelek salın
Derbederi lı ser me de
Qet kêm nabın hezar salın

Dıjmın ne yek, çar dewletın
Sê nıjadın, sê mıletın
Harın, hovın, bêt rûmetın
Xwin vedıxwın hezar salın

Nahêlinın em cejna xwe
Piroz bıkın gor dılên xwe
Bıbın xudan heq mafên xwe
Dıbın asteng hezar salın

Ew tên gelhev bo pırsa me
Dırıjinın ew xwina me
Dışêlinın welatê me
Ew bêbexti hezar salın

Helbet dıjmın tım dıjmıne
Gelo sûcê me qet tune?
Çıra hêz lı dıj hevdune?
Ev dıjberi hezar salın

Bı rasti ev şerma meye
Sûcê mıne, sûcê teye
Ev rewş gel ra zef guneye
Bındest dıji hezar salın

Bese êdi usa nabe
Hêz bıbın yek, ku gel şabe
Newroz lı Kurd her piroz be
Rıza xemgin gelek salın.

## JI BONA BİRANİNA DR:AVDILRAHMAN QASIMLO "KURDPERWER TE BİRNAKIN"

Cangoriyê me ê gewre
Em çu caran te bırnakın
Te birtinın hemû hevre
Kurdperwer qet te bırnakın

Tu pıspor bûy, hım ji rêzan
Nav û deng bûy lı nav hêzan
Rêberê Kurd pırr zıman zan
Kesên zana te bırnakın

Tu şervanê demoqrasi
Tu egiti, tu mêrxwasi
Tu mamosta Kurdê xasi
Kurd çu caran te bırnakın

Pêşmerge ê serê çiyan
Tu rêşan bûy lı her ciyan
Bo doza Kurd te da jiyan
Pêşmerge qet te bırnakın

Ey mırovê aşitixwaz
Şervanê Kurd, gernas û baz
Dıjmın nehişt tu serfiraz
Bibi, em qet ev bırnakın



Dr. Abdurrahman Qasımlo

Dıjmın çêkır tera dafık
Ew Fansê har mınafık
Bı dılê pak te nebır şık
Kurd ew rojê qet birnakın

"Av radıze, dıjmın paye
Herkes xudan doza xweye"
Te ev dıgot, rewş usaye
Gotınên te Kurd birnakın

Hûn sê heval, sê leheng bûn
Farıs bang kır, hûn rabûn çûn
Nızam çawa hûn bawer bûn?
Ew dafıkê Kurd birnakın

Ma we birkır rewşa Simko?
Bêt şık û tırs hûn çûn keko
Farıs mina Fızûl Beko
Kurd wan haran qet birnakın

Keko çıto we ew birkır?
Lı hukma Farıs bawer kır
Dılê me dax, dıjmın şakır
Jan êşa we Kurd birnakın

Lı Viyana hûn rûnıştın
Kê hûn bêt ewlekar hiştın?
Dıjmın derva hat hûn kuştın
Mırına we em birnakın

Hûn pırr zû çûn, bêt mırazın
Lı nav nûr de qenc, baş razın
Em jı Xwedê ev dıxwazın
Xebatên we em bimakın

Gelê we roj bê tola we
Bıstine, rake tırbên we
Çêke kumet heykelên we
Newiyên we, we bimakın

Tu û Fazıl, Qedri Azar
Hûn zana bûn kesên bıjar
Ram lı we be, hezar, hezar
Kurd tola we qet bimakın

Dıjmın Tırk, Ereb û İran
Kurd bimekın ev çu caran
Bo we dılşin Rızê Guran
Si milyon Kurd we bimakın.

5-7-1991 SYDNEY
Roja cangoribûna Qasimlo, 13-7-1989.

## H A L E B C E

Bajarê Helebce lı Rojhılata bajarê Sılêmaniyê, Başûra bajarê Şehrezorê ye. Rûnıştvanên Helebce lı mêjde tekoşer û her nıştımanperwerın. Bı taybeti lı nav heşt sal şerê İran û Iraqê de, Mele'yên Mızgeftên Helebce, lı nav gel û mızgeftan de ruhê netewi û Kurdperweri lûl û gurr dıkırın. Gelek serihıldan lı bajarê Helebce de, dıji sazûmana Saddamê xwinxwar pêkhatın. Gel gelek caran rabûn ketın nav tekoşinên dıj Saddam. Lı bıli ew, carna ji Pasdarên İranê dıketın nav refên pêşmerge û Kurdperwerên Helebce, êriş dıdan ser hêzên Saddam û xesereyên mezın dıgihandın hêzên Iraq. Jı bona ev faktoran bû ku, Saddamê xwinxwar dı roja 16-3-1988' an de bı barbari êriş da ser bajarê Helebce, bombeyên kimyewi lı ser gelê Kurd de barand û pênc hezar kesên kurd, tev zar, zêç, keç, bûk, jın, kal û pir kuşt û cangori kır, deh hezaran zêtır kes ji birindar bûn.

Disa lı eyni salê de, ango dı roja 28-8-1988' an de, hukma Saddamê xwinxwar carek dın êriş da ser herêma Bedinanê, disa bombeyên kimyewi lı ser gelê kurd de barand, bı sedan kes cangori bûn, bı deh hezaran kes ji lı ser erdê bav û kalên xwe de reviyan ketın sinorê Tırkan û İranê derbeder bûn.

2-8-199O' i de, icar hêzên Saddam êriş dan ser Kuweyitê û Kuweyit dagirkırın.

Lı roja 16-1-1991'i de, şerê Delava Basrê -Xeliç- lı bın serokatiya Yekitiya Netewan, Emrika de destpêkır. 28 dewletên hevalbendan êriş dan ser hêzên hukma Saddamê xwinxwar, hêzên Saddam tar û mar kırın û lı Kuweyitê de derxıstın, Kuweyit rızgar kırın.

Lı pışti bınketına hêzên Iraq de, icar Saddamê xwinxwar disa êriş da ser gelê Kurd û çekên kimyewi lı ser gelê Kurd de barand. Lı meha Adar û Avrıl -Nisan- a 1991'i de, nêzıka sê milyon gelê Kurd lı ber çekên kimyewi reviyan ketın ser çiyan û kaşan, lı erdê bav û kalên xwe dûrketın. Bı hezaran ti, bırçi û serman cangori bûn. Bı sedhezaran ketın bın bandûra Tırk û Farıs'an lı wargehan de cıwar bûn. Lı ew wargehan de, disa bı deh hezaran zar û zêç, pir û kal bı ti û bırçi, bın berf û barana sar de cangori bûn.


Xwendevanê delal,
mın bı kurtasi jı tera, jı wera qal û behsa ew bûyeran û ew derbederiyên diroki û tevkuştına bajarê Helebce kır. Tevkuştına Helebce, lı pışti tevkuştına Hiroşima, tevkuştına duweme lı ev cihana meda. Ew tevkuştın rûreşiyek mırovatiyêye lı qurna bistan de. Ev rûreşiya lı diroka mırovatiyê de wê bımine û çu caran birnabe. Dıvê gelê Kurd ji, tevkuştına Helebce û ew derbederiyan, tevkuştına Qoçkiriyê, Şêx Said, Dêrsım, Zilan û hemû cangoriyên xwe birneke.

Xwendevanê eziz,
lı pışti evqas gotınan de, ez dıxwazım piçeki ji jı tera qal û behsa xwe bıkım. Ez Kurdeki Dêrsımım. Endameki eşira İzol'ım. Lı qeza Mêzgırê, lı gundê Kûpıkê de lı dayika xwe bûme. Ez bawerım ez lı İlona, yan ji meha Çıleyê Pêşın, 1936, yan ji disa lı eyni mehan lı sala 1937' an de hatıme cihan. Xudan çar zarokanım; du kur, du keç. Mın lı pırtûka xwe a " Destana Diroka Kurd û Kurdıstan " û pırtûka xwe a " Xıdê Naxırvan û Tevkuştına Dêrsım de " de, qal û behsa jiyana xwe kıriye. Jı bona ev, ez hevce nabinım ku carek dın

lı ser ev tışt rawestım û meselê dubar bıkım.

Ez 25 salın ku lı Awıstûralya de dıjim. Ez lı ber zılm û kuştına hukma Romê û lı ber aboriya xızani reviyam hatım ketım ev welati. Hukma Tırk a faşi jı bona kar û berê mınên cıvaki û Kurdperweri, lı pışti sala 1982'yan de ez lı hemwelatiya xwe de derxıstım û riya mına welêt lı mın qut kır û ez lı hesreta welêt de hiştım. Lê bı rasti ez dı sala 1976'an de, bı fêhmi -resmi- lı hemwelatiya Tırk de derketibûm. Lê disa ji hukma Faşist 22-4-1983'yan de jı mınra ban -ga dagererina welat- bı name- şand."Yurda dön çağrısı". Ku ez lı zıkê mehekida dagerım welêt, ku yan mın bıkuje û yan ji mın bavêje gırtixanê. Helbet ew bangkırın tenê jı bona mın nebû. Lı Awıstûralya de 13 kes, lı tevahiya cihan de ji 15OOO zêtır kesên Tırkiyê. Ango Kurd û Tırkên pêşverû û demoqrat.

RIZA ÇOLPAN



## ÇEND ÇARİNÊN PÊŞNEYARİ JI BONA GELÊ KURD Û MIROVATİYÊ

Qenc bınhêr ey mırov, ev şerma teye
Zarok Gul çiçegın, jın diya teye
Kuştın û xwinxwari karê te nine
Birmeke pey tari, şewq û Roj heye

Ev karê dıjmıne Kurdo birmeke
Bınhêre birbine, her roj berçav ke
Ma çıra em bûne nêçira dıjmın ?
Ev pırsa usa, tu jı xwe, xwe pırs ke.

Cendeg lod bûbûn ketıbûn serhev
Beden helısi, nemabûn çav, dev
Kes nemabûn çalkın ev cangoriyan
Meyit mabûn ser erdan bı roj û şev

Lı pêş deriyan, ser pêpelûkê
Meyitê zarokan, keçık pıtıkê
Dırêj bûbûn gelhev, ser erda sar de
Bınhêre tu Kurdo, çucar birmekê.

Evana mırovın, ne pez dewarın
Meyit serhev de, sedın hezarın
Qurbana çekên kimyewi ne, evan
Hemû mêr jının, zarên bêt zarın



Qenc bınhêr ey mırov, ev şerma teye
Zarok Gul çiçegın, jın diya teye
Kuştın û xwinxwari karê te nine
Birmeke pey tari, şewq û Roj heye

Bı roji û nımêj tu sernakevi
Ku bımini usa her tım bınkevi
Bıbe nûjen, bıbe nıjadek serwext
Ku carek dın ev zılm berçav nekevi

Tera ne pêwiste, meçe Mekke hec
Birbıke tu Ereb, wi meke sertac
Xwedê tenê Mekke, lı Kudsê nine
Çıra dıçi ew der, dıdi geşt û bac?

Te Ereb bawer kır, wi kuştın da te
Dagere ser Rojê, ew jin dıde te
Zerdeştê Magi kalıkê teye
Ew hım rêbere, pêxamberê te

Ser fermana Ereb, pênc car xar dıbi
Gazi Ereb dıki, tobekar dıbi
Jı bo ew can dıdi, lê ew nabine
Ez nızanım çıra tu çav kor dıbi?

Roj jı tera qıble, Helebce hece
Tu jı xwera bıbe Mele û Xoce
Bıbe mırovhez, tu bıbe Xwedê nas
Bawerke ev tışta jı tera hewce

İsa Mıhamed, Dawûd û Mûsa
Ew ji mırov bûn, Bûda her usa
Kesek ne dojeh, bıhişt ditiye
Bıbe aşitixwaz, dıl bıke hêsa



Tu dıbini kesek me Kurd nabine
Dıjmın bı navê İslam qıra me tine
Ne Xwedê dıbe yar, ne ji ev cihan
Bıbine tu bıra, dost dıjmın kine


Tu dıbê " nımêj, avdest qenciye
Zekat qenciye, hec ji qenciye "
Mala te ava, piçek bıhênij
Xarbûn û rabûn, nımêj ew çiye ?

Mırov jı bo kuştın nine, jı bo evini
Xwedê afırandiye bı çav dıbini
Dıvê pırsgırek bı mırovi çareser bıbın
Xwin û kuştın êdi lı jiyan de nemini

Qenc bınhêr tu mırovi, tu ne goştfıroşi
Wexta ku dırbeki dıxwi, canê te dıêşi
Ev a hış bine carek, kûrahi bıhênije tu
Ma çıma mırov dıkuji, evqas bêt hışi?

Erê zef raste, her tışt du ali
Çêbûye bed, qenci, tırşi û tehli
Dıvê aqıl û fels bınxine bedi
Ku gelhev bıjin Hans, Corç, Azad û Weli

Beden kırın çar perçe, organ, organ dûrxıstın
Hêz lı hev cûda kırın, rêber kuştın darxıstın
İro organ lı dûr hev, ketıne tekoşinê
Lê mıxabe jı hevra, ne dılsozın dırıstın



Ev karê dıjmıne Kurdo birmeke
Bınhêre birbine, her roj berçav ke
Ma çıra em bûne nêçira dıjmın ?
Ev pırsa usa, tu jı xwe, xwe pırs ke.

Helbesta biranina tevkuştına Helebce

## REŞ GIRÊDAN


Hezar nehsed heştê heşt bû
Kurdperweran reş gırêdan
Nûçe a reş zû belav bû
Kurd evinan reş gırêdan

Eman, eman, eman, eman
Helebce gırt mıj û dûman
Deh hezar Kurd cangori bûn
Birindaran nedit derman

Eman, eman, eman yadê
Zar, zêç, pir, kal, teyrên Xwedê
Bı ba ê kimyewi mırın
Reş gırêda Kurdo, Werdê

Hewa ewr bû, hinık û sar
Mehe Adar, demsal bıhar
Bı êriş çû dıjmınê har
Deşt û çiyan reş gırêdan

Lı jor de bombe barandın
Kimyewi bûn, can helandın
Qirin, hawar û nalandın
Erd û esman reş gırêdan



Hewa ê jehr jiyan kır zor
Cihan bêdeng ma bû çav kor
Mırın kurmanc, Soran û Lor
Hemû Zazan reş gırêdan

Mıj dûman bû esman, sema
Zar, zêç mırın kesek nema
Helebce bû Hiroşima
Kurdıstanê reş gırêda

Pêşmerge zû derketın der
Dıjmın ba bû, nedıbû şer
Çav kor dıbûn, guh dıbûn kerr
Kevır, daran reş gırêdan

Lı kûçan de meyit hezar
Hevşan de pez, dewar mırar
Tevgerê dit gelek zerar
Hêzên Kurdan reş gırêdan

Lı newal û çal û kortan
Meyitên keç, bûk û xortan
Ahmed, Dêrsım, Cızra Botan
Tev Mem û Zin reş gırêdan

Çar hezar gund, war û bani
Dıjmın xurand dawi ani
Lı tırbê de Feqi, Xani
Tev Cigerxwin reş gırêdan



Lı pêş deriyan, ser pêpelûkê
Meyitê zarokan, keçık pıtıkê
Dırêj bûbûn gelhev, ser erda sar de
Bınhêre tu Kurdo, çucar birnekê.

Lı derva bûn zarokên hûr
Bêt nûçe bûn, lı gunan dûr
Yekser mat man, çav kırın zûrr
Kaw û go'an reş gırêdan

Bav û dayik tev zar, zêçan
Xortên cıwan, tev pir keçan
Bı hezaran hatın pêçan
Caw, tawûtan reş gırêdan

Deh hezaran welat terk kır
Cihan ew dit, lê guh kerr kır
Kurdan jı jehrê ra şer kır
Rê û dırban reş gırêdan

Pıtık berê daykê dımit
Hewa jehr bû kesi nedit
Mırın mêrxwas, gernas, egit
Kesên mayin reş gırêdan

Dıjmınê qexpe û bêbext
Gelê kurd nêçir kır bêt wext
Şewıtand mal, nehişt dar, text
Dar û beran reş gırêdan

Mal de rûnıştıbûn pir, kal
Lı derva bûn heval, delal
Hemû jehr bûn avên zelal
Kani, çeman reş gırêdan



Lı ber pez bûn zarok, şıvan
Mıjek derket lı pêş çavan
Mırın heywan, mırın gavan
Kulav, bılûr reş gırêdan

Pıtık lı nav pêçekan de
Lı hembêza dayikan de
Mırın lı bın xaniyan de
Mal dergûşan reş gırêdan

Zar û zêç lı pêş deriyan
Dıleyiztın, dıgeriyan
Bombe jor de dıbariyan
Ba, bahozan reş gırêdan

Hawariya zar û zêçan
Şina daykan, şina keçan
Pıtıkên çûk natın pêçan
Paç, pêçekan reş gırêdan

Xwişk û bıra, dayik û bav
Derketın der avıtın gav
Felat nebûn qenc nehat rev
Lıng û çêqan reş gırêdan

Bavo kurê xwe hembêz kır
Joni şıkyan, wi ranekır
Lı tev zarok ruh radest kır
Şal û şapık reş gırêdan



Bı roji û nımêj tu sernakevi
Ku bımini usa her tım bınkevi
Bıbe nûjen, bıbe nıjadek serwext
Ku carek dın ev zılm berçav nekevi

Maxa mıriyan ketın ser hev
Pûç bûn beden neman çav, dev
Werge lı der man roj û şev
Stêr, pêwran reş gırêdan

Bêt nefes man ketın erdê
Evin, Dilan, Şêrko, Werdê
Mınna wan nedit Xwedê
Xwedê nasan reş gırêdan

Bı hewa ê jehr fetısi
Bın tavê de can helısi
Nedit Xwedê, Mehdi, Mehsi
Çıl melekan reş gırêdan

Ax lı mın, ax lı mın yadê
Newiyên Kurdo û Werdê
Mının laş man lı ser erdê
Tevır bêran reş gırêdan

Tawûs Melek, Ahûra Mazda
Ew bêdeng man lı tev Yezda
Qet hêzeki, hêzek neda
Şewq tariyê reş gırêda

Xuya nebû Zerdeştê kal
Cih ranebû Rustemê Zal
Tıji cendeg kort û newal
Çal û kortan reş gırêdan



Bınhêre lı ev konan, bınhêre ev çadıran
Ev rewşa gelê Kurd bû, lı ber zılma neyaran
Reviyan ketın ev rewş, bıra Kurdo birmeke
Kesên wek Saddam, Kenan, Xumeyni û xwinxwaran

Zû belav bû ew nûça reş
Kurdek nema rûken, dılgeş
Şeş kişwer û Hind û Hebeş
Yarên Kurdan reş gırêdan

Wêneguhêzên cihanê
Ew rewşa anin ekranê
Jin tunebû lı meydanê
Temaşvanan reş gırêdan

Emperyalan dengek nekır
Hukma Sovyek qet şerm nekır
Ew rewş dılê Saddam şakır
Pêşverûyan reş gırêdan

Saddam, Xumeyni û Ozal
Ew dıjmının/nabın heval
Rewş lı ber çav roni, zelal
Pipıka çavan reş gırêdan

Dıjmınek ji Hafız Esat
Ehrimanê bêbext, fêsat
Ew tevkuştın lı wi xweş hat
Eyûbi kal reş gırêda

Bıra ê Kurd ders bıstine
Jı xwera rêki bıbine
Cihanê negot Kurd kine
Mırovhezan reş gırêdan



Evana mırovın, ne pez dewarın
Meyit serhev de, sedın hezarın
Qurbana çekên kimyewi ne, evan
Hemû mêr jının, zarên bêtzarın

Lı bûyeran em mêzekın
Dost û dıjmın hev cûdakın
Em bıbın yek hevra şerkın
Dılsozên Kurd reş gırêdan

Em tıba xwe, xwe bıkolın
Dıjmın Ereb, Tırk Moxolın
Me dıkujın hezar salın
Sal û qurnan reş gırêdan

Kurdıno dirokê vekın
Bınıvisinın qet birmekın
Ruhê cangoriyan şakın
Pênûs, defter reş gırêdan

Şêx Said, Helebce, Zilan
Dêrsım, Axri jan kır dılan
Ev helbesta Rızê Guran
Mala Guran reş gırêdan.






















Cendeg lod bûbûn ketıbûn serhev
Beden helısi, nemabûn çav, dev
Kes nemabûn çalkın ev cangoriyan
Meyit lı ser erdan mabûn roj û şev


DODGE























































## DİSA JİYAN JEHR KIR DIJMIN

Disa jiyan jehr kır dıjmın
Kurd, Kurdıstan agır dıkır
Gaza xerdal lı jor esmin
Balefıran belav dıkır

Lı ber ba ê jehr û axû
Kurd reviyan bı lez û zû
Malan de dernedıket dû
Dıjmın ocax me kor dıkır

Zarok, dayik dıgiriyan
War cihiştın ketın riyan
Beri dan aliya çiyan
Berf baranê rev zor dıkır

Sê milyon Kurd riyan ketın
Kaş û çiyan de daketın
Erdê bav kalan dûrketın
Paşva dıjmın êriş dıkır

Qirin, hawar, şini, giri
Asteng serma, simên dırri
Berf baranê, lehi, heri
Mırov dıkuşt wenda dıkır

Xec û Fatan, Bes û Meman
Dırıjandın hêstrên çavan
Dıjmın Ereb, yek ji zeman
Bı gelê Kurd tınaz dıkır




Zılma Saddam Husen û derbederiya
Adar û Avrıl'a sala 1991

Şewıtandın war û bani
Xwin henki mina kani
Teknikê bêbexti ani
Mılên şêran dıl xem dıkır

Bı hezaran zarokên çûk
Lıngên xasi jın, keç û bûk
Bın baranê, bın berfa pûk
Dev, dıranan çeq-çeq dıkır

Ne lıhêf bû, ne ji nivin
Dıncıfyan dıkırın şin
Bı bırçi, ti gelek bûn din
Xwaşan gazi Xwedê dıkır

Xwedê bûbû çav kor û kerr
Qet nedıdit kuştın û şer
Meyitên Kurd çalbûn her der
Wi bêdengi mêze dıkır

Ew ji bûbû Ereb, Saddam
Lı Bexda ê, Mekke û Şam
Mina dıjmın bêt şerm û ram
Wext fıtar bû, zık têr dıkır

Bı aliki zıkên bırçi
Bêt cıl, nivin, bêt xani ci
Cihan Kurd ra bû tari, si
Rojê ji xwe wenda dıkır



Xarbû dayik lı ser pıtık
Çend mehini, bedew, rındık
Ser mılan de hêdi, hındık
Mırınê ra zor şer dıkır

Bın berfê de hate kuştın
Wext tunebû nate şoştın
Kesên gelhev, tev rûnıştın
Mele dıxwend dıwa dıkır

Lı ser berfê jın duxwaskan
Dıbûn, lı ser joni, çokan
Lı hındırê çar, pênc deqan
Pıtık dımır, dê şin dıkır

Dergûş lı ser pışta daykan
Dıreviyan ber şer, çekan
Bar gıran bû lı ser çêqan
Ew rev û meş dıjwar dıkır

Zıkên bırçi, çavên bêt xew
Ne nan hebû, ne tasek dew
Ber ba ê jehr Kurd çêlekew
Bûbûn, neyar kêf xweş dıkır

Hezaran tırb hatın kolan
Bo zarokan, pir û kalan
Ew rewşê jan, êş kır dılan
Tevır bêran erd kûr dıkır





Evana leşkerên Romê ne, Roma bêt ram û rûmet
Dıjmınê jinê ne, nızanın dılovani û merhamet
Wek gurên dev bı xwinın, erişkar û xwinmijın
Kuştınê hezdıkın, qet nadın jinê hêja û qimet

Tevır û bêr lı dest xortan
Tırb dıkolan ser kaş kortan
Meyit tazi mina pûtan
Bêt caw kefen, wan çal dıkır

Sinor gırtın Tırkên Gurgewr
Tev Farıs'an, qet nema sewr
Jiyan dojeh bû lı her der
Tırk û Farıs dılşa dıkır

Yekitiya gelê cihan
Rûnıştı Newyork wê da ferman
Bo parik nan, şûşek derman
Esasên xwe betal dıkır

Çin û Kûba lı tev Sovyet
Ew bûn dıj Kurd, bûn bêt rûmet
Tira tûj lı dıl, ciger ket
Mırovhezan zef şerm dıkır

Lı ser navê Sosyalizmê
Bûn hevparê kuştın, zılmê
Tev xwinxwaran, tev Faşizmê
Sosyalistan fedi dıkır

Ew tevgera bêt namûsi
Qet nasnekır demoqrasi
Birkır heqê çarenûsi
Wan, Kurdıstan betal dıkır

Ax lı mın lo, ev çı halê?
Kurd tên kuştın çendsed sala?
Gerdûn kore, kerr û lale
Kurdevinan rewş doz dıkır

Meha İslam, ew a evrar
Remezan bû roji fıtar
Saddam xwina Kurd vedıxwar
İslam pesna Saddam dıkır

İslam birkır Selahaddin
Neda Kurdan qet heq û jin
Ew tevgerê Kurd kırın din
Dirokzanan rexne dıkır

Dıvê bêjım İslam çiye
Gelo Roje, gelo siye?
Kê bıhişt dojeh ditiye?
Kesi ev pırs, pırs nedıkır

Artêşên İslam'ên barbar
Xwin vexwarın jı wanra kar
Bûbû, wana wek gurên har
Ser û zıman wan jêdıkır

Destên wan de şûr û kemend
Dıgotın"bıbêj Mıhamed
Balyozê Xwedê û semend"
Wana werge ferman dıkır



Cendeg lı ser mılê dayik û bavan
Dıxwazın zû gorkın,lez davên gavan
Bêt kefen bınax dıbın mıri, bıhızır ey jındar
Ev şerma mırovatiyê ye, qenc bine ber çav

Zar zımanên sed hezaran
Qutdıkırın wan xwinxwaran
Çıto birkın em neyaran?
Wan Kurdıstan talan dıkır

Lewra İslam har faşiste
Lı dest ew de tir û xışte
Çı dojeh û çı bıhişte?
Aqıl dıgot raçav dıkır

Roja derketına İslam
Ew ramanê Kurd kır xulam
İro ew dem nine balam
Disa ji Kurd bawer dıkır

Kurd İslamın, dıjmın İslam
Zerdeşt birda, got"lam, kelam"
Qedexe kır zıman, kılam
Ola İslam şerm nedıkır

Mêmê derxıst qıble û hec
Ku gel bıçın ew bıdın bac
Ereb bıkın serser û tac
Wina werge ferman dıkır

Kurdo bese çavan veke
Ola İslam bınhêr seke
Quran çirok tu bawerke
Ereb bo maf derew dıkır



Ez ne dinım, ne ji gêjım
Naxwazım pırr tıştan bêjım
Dıxwinım İslam û dıjim
Aqıl qet Kurd fêm nedıkır

Ez dagerım ser bûyerê
Lıgel daykê, lıgel yarê
Evqas bıbêm ez ev carê
Aqıl pênûs ikaz dıkır

Aqıl got"tu mebe Selman
Wê derxinın tera ferman
Bo ev helbest, bo ev raman"
Mêjo lı mın şiret dıkır

Hemû xeyri İslam bûn yar
Kurd dıditın bın berfa sar
Pırr giriyan dan arikar
İslaman hesûdi dıkır

Ew welatên hemû İslam
Lı tev jın û zar û zılam
Bûn temaşvan nedan selam
Kurdan dıjmın nasnedıkır

Hın kesan dıgotın"Xwedê
Tev Saddamê bavo, yadê
Lı esman dakete erdê"
Olperestan nımêj dıkır



Kurd birnekın Filistinan
Bo doza wan gelek can dan
Xwe bırçi man, dan wan av, nan
Wi geli ew zû birdıkır

Cem Saddam cih gırt Arafat
Textê xwe dani lı Bexdat
Qet hawara Kurd de nehat
Wi qewmê xwe berçav dıkır

Çermê beraz qet nabe post
Tırk û Ereb ew nabın dost
Bav dayikan usa dıgot
Ew metelok xwe rast dıkır

Rev û mırın her zêde bûn
Gund û bajar tev vala bûn
Hêzên kurdan şaş metal bûn
Kurê Barzan gazi dıkır

Mesût rabû deng bılınd kır
Wi gelê xwe agadar kır
Got"rev tune"wi ferman kır
Dayik, bavan zef xem dıkır

Agadari wi da cihan
Kurd pêrişan ser kaş çiyan
Rewş xırab bû lı her ciyan
Mesût cihan serwext dıkır



Mesût Barzani

Got"gelê Kurd şer naxwazi
Tenê erdê xwe dıxwazi
Dıjmın me dıkın rût, tazi
Bese"dıgot, dıl reş dıkır

Kurd diroka Rojhılatın
Aşitixwazın, lê bed bextın
Perçe bûne bêt qêretın
Dıjmın lı ev, qenc kêr dıkır

Pışti ewqas kuştın û xem
Derbaz nebû pırr zeman, dem
Saddam bang kır Celal çû cem
Wan xwina Kurd erzan dıkır

Rûnıştın ser textên zêrin
Bı ken û kêf hevdu nêhrin
Peyvên şirin, havıl gerin
Celal tızbih qenc kaşdıkır

Eman, eman, eman, eman
Çiyan pırr gırt berf û dûman
Lı pêş çavên hemû cihan
Talabani seg maç dıkır

Çıto birkır wi ewqas xwin?
Wê tevgerê kurd kırın din
Ciger perçe, dıl me bû şin
Fırşıka Kurd ikrah dıkır




Celal Talabani û Saddam hev maçdıkın

Pırsa Kurd a navnetewi
Xwastın ku bıkın herêmi
Dıbên"gû tê xwarın germi"
Celo ê me ew birdıkır

Me hêvi bû kurd bıbın yek
Sazkın konseyek rêkûpêk
Pêşerojan de dewletek
Çêkın, me dıl daxwaz dıkır

Derd û derman havıl ev e
Roj pey tari, lı pey şeve
Rıza dılêş nake xewe
Kesên bêt xem, xew xweş dıkır.





Lı bın berf û baranê, ber ba û bahoz
Qemırine beden û sımbêl, pışt ji bûne xûz
Cemşit lı tırbê de dıgire, Zerdeşt dılşine
Nav xwinê de derbaz dıbın dilani û şahiyên Newroz









**Ti û bırçi bêt starın evana, ketıne ser çiyan**
**Bı sedan cangori dibûn, dojeh bûbû jiyan**
**Xwedê o tu nepejırini ev rewşa gelê Kurd**
**Tirk, Ereb û Farıs jı mera jehr kırın jiyan**














Flight of the Kurds: young refugees ride a bulldozer at a tent camp in northern Iraq.













**Kurd dımeşın lı bın berf û baranê**
**Lı ber zılma Saddam dırevın, naçın seyranê**
**Qenc binıne ber çavan ev rewşê, Kurd bırano**
**Eva derbederiye, ne jin û jiyane, şerma cihanê**





Zarok dımırıyan lı hembêza dayik û bavan de
Bı hezaran bınax bûn lı ser çiyan û bın daran de
Hıstêrên xwaşan bûbûn çem û kani dıherıkiyan
Herkes dıgiriya, şiniyek hebû lı nav jın û mêran de


























Helikopter lı jor de jı Kurdan ra nan davêje jêr


















Ev lawık diya xwe û bavê xwe, xişk û bırayên xwe wenda kıriye, lı van dıgere



Pêşmerge ê 70 salıni







Keça Kurd lı bın berf û baranêdaye.










Leşkereki yekiya gelan û rewşa Kurdan







Keça Kurd Nêrgız, ew ji lı ber zilma Saddam reviyaye,
bûye penahende û terki welat















Avahiya Parlamento a Paytextê Kurdıstan'a Başûr
H E W L Ê R









DERKETINA PKK

Hezar nehsed heftê û heft
Sazbû PKK nebû zeft
Kışand jı xwera rê û xet
Wê doza Serxwebûn dıkır

Xêncı xwe kesek nasnekır
Qet guhdare kesi nekır
Dost, dıjmın hev cûda nekır
Bırakuji ferman dıkır

Kê ku weka wê nedıgot
Ew dınıvisand dıkır not
Jı wana ra "xayin" dıgot
Kuştına wan ferman kır

Bı dest maçkırın û tıka
Apo bıngeh gırt lı Beka
Roj bı roj hêz bû PKK
Dewleta Tırk zef xem dıkır

Baregeh lı Beka dani
Lı wê avakır mal, xani
Bû dıj hêzên Kurdıstani
Hafız Esat dılşa dıkır

Lı geliya Beka ê de
Bın bandûra Sûriyê de
Tevger geş bû ew demê de
Apo deng her bılınd dıkır

Ocalan rûnışt lı Şamê
Ferman derxıst jı bo Romê
Qet neket nav şık û xemê
Wi gotına Ereb dıkır

Hezar nehsed heştê çaran
Ferman kır Apo Ocalan
Hınek xort tev keç, mındalan
Wan destpêka tevger dıkır

Roja çardehê Tebaxê
Tevger destpêkır ew çaxê
Beridan Botan, Şırnaxê
Apo dawi mêze dıkır

Romê şand Sûriyê Sezgin
Du dıjmın hevra bûn bengin
Peyman bı pênûsên rengin
Nıvisandın, gel xem dıkır

Hafız Esat Apo derxıst
Bervı Saddam Husên rêxıst
Dırbek gewre lı Kurdan xıst
Ocalan qet deng nedıkır

İcar Ocalan çû Iraq
Ket bın bandûra ew Dehaq
Kurdperweran kırın meraq
Herkes dawi zef xem dıkır

Lı Başûrê şert, şûrt çêbûn
Rêberên Kurd gelhev kombûn
Bıryar gırtın lı şûn rabûn
Wana doza dewlet dıkır

Lı wê hılbıjartın çêbû
Bı zagoni dewlet sazbû
Gelê Kurd tevda dılşa bû
Apo dewlet nasnedıkır

Lı dıji ew dewlet derket
Got "nasnakım" ew cınan ket
Dawiyê de agır vêket
Gelê Kurd pırr dıl reş dıkır

Lı Başûrê çêkır wargeh
Xwast ku lı wê bıgre bıngeh
Fehre bıke xwera bergeh
Dewleta nû her xem dıkır

Gotın " Apo zûke derkev
Bervı Bakûr bıçe rêkev
Lı pey xwina bıran mekev"
Apo dıgot "na" rık dıkır

Şerek derket lı nav bıran
Bı tıfing û çekên gıran
Artêşa Tırk mina guran
Ket nav ew şer, erd zeft dıkır

Sedem ji ew rıka Apo
Hatın kuştın Hes û Keko
Tev Gulrız û Mem û Şêrko
Gelê Kurd rewş nalet dıkır

Bırano evan birmekın
Dost, dıjmınan hev cûdakın
Bıbın yek welat avakın
Rızê Gur ev şiret dıkır

## ÇEND ÇARÎNÊN DILŞABÛNÊ HIN PÊŞNEYARÎYÊN MIN

Beri serokên eşiran
Dıbûn liztokên neyaran
Lı dıji hev şer dıkırın
Dırıjandın xwina bıran

Tev neyaran kar dıkırın
Hêzên xwe qels, jar dıkırın
Jı bona berjewendiyên xwe
Gelê Kurd telef dıkırın

Mêj de İdris'i Bitlis'i
Bû yarê Roma, İblis'i
Wi Kurdıstan kır du perçe
Da eslê Moxol, Faris'i

Pırr kes lı pey wi meşiyan
Tev xelet û tev şaşiyan
Bûn hevalên Tırk, Ereb'an
Dılê daykan her êşiyan

Domkır ew rewş bı sed salan
Reş gırêdan, bav û kalan
Eşir hevra qet nebûn yek
Dıjmın hat ket zıkê malan

Mal û hebûn talan kırın
Namûsa Kurd peymal kırın
Çı ditın ser erd û bın erd
Ew şêlandın hemû bırın

Nehiştın ku Kurd hişyar bın
Xudan maf û warên xwe bın
Sê nıjadan bı zılm, zorê
Xwastın Kurd nokerên wanbın

Lı navbera qurna bistan
Avabûn Parti, Dıbıstan
Parti ji bûn wek eşiran
Xwe birkırın Kurd, Kurdıstan

Yekatiya Nıştımani
Şerkır lı hember Barzani
Bı sedan Kurd hevdu kuştın
Bı xeşimi, bı nezani

Bıra rabûn lı hember hev
Roj jı Kurd ra bû tari, şev
Doza welêt dan aliki
Dıjmın qenc neanin ber çav

Rojek ji sazbû PKK
Ku ew doza welat bıke
Wê ji gelek bıra kuştın
Xwedê evan qebûl neke

Sal û zeman derbaz bûn, çûn
Hêdi hêdi Kurd şiyar bûn
Pıştî ewqas xelıtan de
Hatın bahev, em her şabûn

Lı pışti ewqas xelıtan
Aqıl ket mêjo, seriyan
Ditın ku ew dıbın nêçir
Rûnıştın rewşê nêhriyan

Gotın " qet kesek serê xwe
Rızgar nake ew gelê xwe
Dıvê êdi em bıbın yek
Ku rızgar kın welatê xwe"

Lı pey milyon cangoriyan
Pey kêmasi, xelıtiyan
Lı dawiya qurna bistan
Rêberên Kurd hev şêwıriyan

Apo, Bûrkay, Talabani
Tev Hemreş Kurê Barzani
Lı Lunban'ê hatın bahev
Tırbê de dılşa bû XANİ

Hevra gotın " usa nabe
Em bıbın yek, ku gel şabe
Yek hêz serê xwe nıkare
Lı bın ev bari de rabe

Ev bar barê rızgariyê
Serxwebûn û azadiyê
Hezar salın em hesretın
Bo ev dıkın hawariyê



**Kemal Bûrkay, Avdılah Ocalan, Celal Talabani û Hemreş**

Evqas bese giri û şin
Nemine şer, kuştın û xwin
Nav bıran de ev tışt rabe
Azad bıbe welat û jin"

Lı xelıtan ders standın
Nûçe jı cihan ra şandın
Rûnıştın ew mina bıran
Dılê neyaran dırandın

Pıştı xwina sed hezaran
Hember çar dıjmın neyaran
Riya Serxwebûnê vebû
Tırs ket dılê koledaran

Nav xwe de peyman çêkırın
Bûn yarên hev, hev maçkırın
Bı ew tevgera diroki
Si milyon Kurd dıl şakırın

Ahmed da Apo du pênûs
Jı bo dayka xudan namûs
Got " rawestin şerê bı xwin
Pênûs karbin bo çarenûs

Dıvê em bı hevra karkın
Hember dıjmın yekbın, şerkın
Ev havıla Serxwebûnê
Bı ev rengi em gel şakın "

Rabûn dest dan hev wek, bıran
Ku rakın ew barê gıran
Nemine hesreta salan
Rızgar bıkın ew Kurdıstan

Xwedê şıkır hezar cari
Kurd tên bahev bo hevkari
Êdi dıxwazın bıbın yek
Ku nebın ewqas cangori

Bıji Apo, bıji Kemal
Bıji Mesût, bıji Celal
Çêbû eniya Kurdıstan
Bıji dewleta FEDERAL

Bıji Hicri, bıji Hemreş
Serokan gel kırdılgeş
Hêvi ew e veneqetın
Ku Kurd nebinın rojên reş

Bı ev kari em şanazın
Bo azadi lez û bezın
Dused salın em şer dıkın
Erd û warên xwe dıxwazın

Ev gav bervı azadiyê
Dılgeşiyê, şanaziyê
Hêvi dıkım pêşerojan
Hın kes nekın fêlbaziyê

**Daxwazi erdê Kurdıstan**
**Çiya, deşt û çem, darıstan**
**Dıvê her bostek erdê me**
**Felat bıbe lı bın destan**

**Rojek zû welat rızgar be**
**Xema hezar salan birbe**
**Avabın sazgeh dıbıstan**
**Gelê Kurd her serbılınd be**

**Cihê zanyari avabın**
**Kurd bıxwinın ferzane bın**
**Herkes bıbine Kurd kine**
**Xudan şan, xudan rûmet bın**

**Çand û zıman her geş bıbe**
**Diroka rast ronak bıbe**
**Cihan bıbine rastiyan**
**Tırk, Fars, Ereb rezil bıbe**

**Xwendevanên hêja, delal**
**Mın xwast rewşê bıkım zelal**
**Mina beri tevger mekın**
**Hevra bıbın bıra heval**

**Ev şireta Rızê GURAN**
**Jı bo xwişk û jı bo bıran**
**Dıvê Kurd jı xwe birnekın**
**Sê nıjad û çar neyaran**

## " TÊBİNİ "

Rêberên Kurd mexeyidın
Hûn ne Xwedê, ne Seyid'ın
Mın xelıtên diroki got
Dirokzan, şade, şahidın

Ez dostê hemû hêzanım
Zevya hêşın, ne xozanım
Mın xwendiye, mın ditiye
Piçek rêzan, ez hozanım

Mebên ev tıştan nebûne
Bıra dıj hev ranebûne
Sed mıxabın ku ev rastın
Lı evan dıjmın şabûne


İro şuva xelıt nebın
Bıra dıji hev ranebın
Pıştgıriya hevdu bıkın
Ku dıjmın ra nêçir nebın

Bêt derew bejn û bala me
Fizyonomi, aqılê me
Lı dıjmınan pırr çêtıre
Her paqıje diroka me

Mêj de ew mırov evimın
Roj û agır dıhebinın
Me gotiye " Heftê du gel
Têr bın em pey wan bıminın "

Heftê du gel têr, azad bûn
Xudan war, xudan dewlet bûn
Êdi iro dora meye
Şıkır bo ev Kurd serwext bûn.

Sed mıxabın ku ev gotınên mın û ew dılşabûna me pırr dom nekır, disa navbera hêzên Kurd de şer derket, bı sedan keş hatın kuştın. Yekitiya hêzan û Konseya Netewi ji her usa disa jı bona me bû xem û xeyal. Disa her hêzek bı serê xwe kar dıke û bı hêsai ji, jı dıjmınan ra dıbın nêçir. Lê Xwedê axıriyê xêr bıke, weki dın ez çı bıbêjım.



Weşanên Dersim